

### Rûxandina mirateyên pişt-Sovyetê

Heger tedbîrên lezgîn neyên girtin, heta sala 2025'an dê Rêhesinên Ukraynayê hebûna xwe biqedîne. Ew ji salên 90'î ve nehatine tamîrkirin, şewata jixweber a trênan hema hema bûye norm. Trêna mazotê Sumi-Merçik şewitî... ***Kurdistan Lezgiyeva / R.8***



### Dengbêjî ne karê kalan tenê ye

Dengbêjî giyanê demê ye, giyanê deng e, sewta dîrokê û zimanê kurdî ye. Têkildarî hunera dengbêjiyê me bi dengbêj Îsmaîl Çigrim ê 18 salî re xeber da. Îsmaîl dibêje ku dengbêjî ne karê kalan tenê ye û her kes dikare dengbêjiyê bike...***R.11***




### GOG ji kêf û şahiyê wêdetir e

Kovara Wêneromana Kurdî a Zarokan GOG ku bi zaravayên kurmancî û kirmanckî weşanê dike, bi hejmara 3'yemîn a meha nîsanê, hat weşandin. Têkildarî kovarê rêvebirê giştî yê kovara GOG'ê Îmam Cîcî bersiv dan pirsên me...***R.11***


# xwebûn

12-18 NÎSAN 2021 HEJMAR: 69 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Zarokên me ji dest diçin!

Em bi destê xwe zarokên xwe radestî dewletê dikin û vedigerin dibêjin çima zimanê me bi kar naynîn. Xwezî tenê mijar ziman bûya. Ziman bi hêsanî tê fêrkirin û kêmasiyên wê bi demajoyê re vedigerin. Lê rewşa heyî xerabtir e. Dema ku em bi kêfxweşî zarokên xwe dişinîn dibistanên wan radestî dewletê dikin. Ziman, kultur, tore, erf û edet li gorî dewletê dibe... ***Ehmed Pelda / R.7***




## *Wezîr kurdî înkar kir, qeyûm jî tabelaya kurdî rakir*

*Dijberiya rayedarên dewleta tirk a li hemberî zimanê kurdî her tim xwe dide der. Wezîrê perwerdeyê yê hikûmeta AKP'ê got ku destûrê nadin xebatên zimanê zikmakî. Qeyûmê ku ji aliyê AKP'ê ve hatiye tayînkirin li Farqînê tabelaya kurdî rakir û tabelaya tirkî bi cih kir. Platforma Zimanê Kurdî bang li her kesî kir ku piştgiriyê bidin kampanyaya ku ji bo kurdî hatiye destpêkirin...* ***R.3***

## Parastina zimanekî

Ewil axêverên zimanekî dimirin û zarokên wan pêdivîyê pê nabînin ku bi zimanê xwe yê dayikê biaxivin. Ji bo ku zimanek bijî, divê ne di bin tadeyî û polîtîkayên asîmîlasyonê yên dewleteke de be û di jiyana rojane de bi awayekî aktîf bê bikaranîn. Wek mînak, zimanê bi navê 'adîge' ku tenê li du gundên Îsraîlê tê axaftin, ji aliyê dewleta Îsraîlê ve tê parastin û di dibistanê de perwerde bi vî zimanî tê dayîn. Ji ber ku dewleta Îsraîlê polîtîkayên asîmîlasyonê nameşîne zimanê adîge, fersenda xweparastinê bi dest xistiye. Li dinyayê hin sazî û dezgeh dixwazin bi rêya medyaya civakî û înternetê zimanên di bin talûkeya tunebûnê de ne, biparêzin. Pêşketina teknolojiyê jî vê derfetê dide. Bi rêya hin aplîkasyonan, wek mînak; zimanê cherokee yê ku zimanê herêma bakurê Amerîkayê ye...
***Nûh Bozkur / R.5***

## Jinên ji azadiyê bawer dikin

Heke em niha careke din li rewşa heyî ya jinên herî dawî hatin binçavkirin û girtin binêrin, aktîvîstan çi li hundir çi li derve li ser lingan in û serî natewînin. Ger em wan mijaran di tabloyek de bînin cem hev, xwîn, tundî û mirin derdikeve pêş. Lê ger em bi çavek din lê binêrin em, azadî, aramî, têkoşîn, demokrasî û berxwedanê dibînin. Ger em bi çavê din li tabloyê binêrin serkeftina jinan ji niha ve xuya dibe. Wê tu êrîş li ber wan nebe astengî, ev tenê meseleya bijartinê ye. Belasebep nayê gotin her zayîn bi êş e, bêguman zayîna azadiyê jî ya herî bi êş û bi bedêlên giran e lê em ji bîr nekin emrê mêşan... ***Eylem Şoreş / R.2***

## Di dîroka îslamê de bêpergalî 2

Bi rastî mirov dibêje qey dîroknasî bi awayekî aşkera bi Cemaleddîn Afganî dest pê kiriye lê gava mirov baş bala xwe bide dîrokê, mirov bi awayekî zelal dibîne ku di wê dema kurt a Hz. Muhammed pêxemberî ragihandî de jî xuya dibe û mînak hene. Wek nasix û mensux; ev yek hinartina hukmekî demkî ango hukmek tê di demekê de pêdivî bi wî hukmî namîne, ew hukum radibe yan diguhere. Her çiqas ev kiryar hemû beşên olê û alim li ser ne hemfikir bin jî li ser vê yekê gengeşî hebin jî, rewş û dîroka îslamê vê yekê wek hewcetiyek dîrokî dide diyarkirin. Em dikarin çend mînakan ji dema... ***Emîn Dilsoz / R.8***

## Soza min û biraziyê min

Li nav me kurdên Xorasanê weke her devereke kurdnişîn, hin deb û resmên kevn hene. Yek ji wan resman sinetkirina zarokan an bi gotina me 'desthelalkirin'a wan e ku em bi şahî û dîlan bi rê dixin. Çend rojan piştî birêxistina cejna desthelalkirinê, bang li kirîvê xwe dikin û bi wan re dibêjin ku dixwazin wî karî bikin. Kirîv li nav me kurdan pir bi qedr û girîng in. Kirîvatî cureke soz û qirarê li nav du malbatan e. Gava ku du malbat bi hev re dibin kirîv, hin erk û wezîfeyên wan li beranberî hev hene. Wek mînak li keçikdayîn û bûkxwestinê. Li desthelaliya lawikan... ***Mecîd Rehwerd / R.12***

# Çalakiya greva birçîbûnê bi biryar dewam dike




Girtiyên PKK û PAJK'î ku li dijî tecrîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Girtî nêzî 140 roj in li ber xwe didin. Çalakiya li Mexmûrê nêzî 120 roj in û ya li Yewnanistanê jî zêdetirî 100 roj in dewam dikin. Rêveberên HDP'a bajêr a Amedê ji bo balê bikişîne ser greva birçîbûnê li Parka Koşûyolûyê çalakî li dar xistin... ***R.3***

## Rojeva civînên gel tecrîd e

Hevdîtina gel a bi şîara "Li dijî faşîzmê em xwe birêxistin bikin" a li Mêrsînê dewam kir. Şandeya ku ji hevserokên KCD û DBP'ê, parlamenterên HDP'ê pêk tên beşdarî civînên gel bûn. Hevserokê DBP'ê Keskîn Bayindir anî ziman ku starta şerê li dijî kurdan bi şidandina tecrîdê tê dayîn û li dijî tecrîdê banga têkoşînê kir.

## Rûreşiya Ewropayê

Hefteya borî serokê Konseya Ewropayê Charles Michel û seroka Komîsyona Yekitiya Ewropayê Ursula von der Leyen li ser navê 27 welatên endamên Ewropayê serdana Enqereyê kirin. Serdana serokên Konsey û Komîsyona Yekitiya Ewropayê, Charles Michel û Ursula van der Leyen di qada nevneteweyî de ji gelek aliyan ve bi nêrîn û perspektîfên cuda hat dîtin. Lê yek mijara sereke ku derket pêş ji naveroka hevdîtinê zêdetir bêrêziya li hember Leyen hat kirin bû...
***Felemez Ulug / R.6***



## Qedexe ne zanistî ne

Dr. Halis Yerlikaya têkildarî rewşa dawî ya nexweşiya koronayê pirsên rojnameya me bersivandin û anî ziman ku qedexe ne li gorî ferasetek zanistî ne û ji destpêkê vir ve pêvajo baş nehat birêvebirin... ***R.4***

## 'Hesar û kûçikên bavê min' girêgûtk* e!

Di bîra civakan de hin girêk hene zû bi zû venabin û sîrayetî hemû qadên jiyanê dikin. Girêka Gordîonê jî li ber gelekî hêsan dimîne ku Skenderê Zulqirney ew bi derbeke şûr ji nav hev derxistibû. Lê girêkên di jiyana civak û miletan de ne wisa hêsan in ku bi derbeke şûr an jî bi ferman û peyman û biryarekê ji hev werin vekirin. Ew girêk kod in, kodên civakî ne. Lewma jî guherandina wan ji gelek aliyan ve zehmet e. Gelek caran di berhemên hunerî de guherandin û çareserkirina wan girêkan dijwartir e. Dîrok, psîkolojî, mîtolojî, civaknasî û gelek warên din ên zanistê jî nikarin bi carekê re wan girêkan çareser bikin. Di romana Şêrzad Hesen a bi navê 'Hesar û kûçikên bavê min' de jî vekirina wê girêkê maye ji demê re. Roman bi plansaziya kuştina bav anku bi kuştina pergala baviksalariyê...
***Sîdar Jîr / R.5***

# Ên ji azadiyê bawer dikin dê tu carê ranewestin

Eylem Şoreş

**Ger em bi çavê din li tabloyê binêrin serkeftina jinan ji niha ve xuya dibe. Wê tu êrîş li ber wan nebe astengî, ev tenê meseleya bijartinê ye. Ma belasebep nayê gotin her zayîn bi êş e. Bêguman zayîna azadiyê jî ya herî bi êş û bi bedêlên giran e**

Em gelek caran qala astengî û êrîşên dewleta tirk ên li hemberî kurdan û bi taybetî li dijî jinan dikin. 5'ê nîsanê careke din êrîşî aktîvîstên li Amedê kirin. 22 jin di encama vê êrîşê de hatin binçavkirin, 6 jê bi îdîaya endamtiya rêxistinê hatin girtin. Lê di vê êrîşê de, xala esasî ne girtina jinan û îşkencekirina wan e. Ev qirkirina siyasî di bingeha xwe de nîşandayîna sînoran e. Hikûmetê heya niha fêm nekir ku êrîşên li dijî jinan dê têkoşîna wan sînordar nekin. Berovajî wê, çiqasî êrîş li jinan tê kirin rêxistinbûna wan û hêza wan zêdetir dibe. Di vî warê de, em dikarin bal bikişînin ser helwesta hevşaredara Qersê Şevîn Alaca jî. Di heman hefteya ku 22 jinên li Amedê hatin binçavkirin û girtin de, Şevîn Alaca ji girtîgehê hat berdan. Helwesta wê mînakek ji berxwedana jinan e. Bi kurtasî hevşaredara Qersê got; "Ez ê serî netewînim û ji devera mayî dewam bikim."

Me ev helwest ji destpêka salê vir ve bi gotinên cuda her û her bihîstiye û xwendiye. Jinên hatin girtin, binçavkirin û jinên li derve ji bo hevalên xwe têdikoşin, bi rêbazên cuda heman tiştî dibêjin. Lê ew tenê nabêjin, her wiha ew heman têkoşîna xwe li qadên berxwedanê jî didin nîşan. Hikûmet di roja Newrozê de, di roja berxwedana kurdan de biryara xwevekişandina ji peymana Stenbolê dabû. Ji vê rojê vir ve, jinên li Bakur û Tirkiyeyê derdora xwe dihejînin. Jinan bi hemû çalakiyên xwe heya niha diyar kir ku ew ê ji bo mafên xwe yên bingehîn têbikoşin û vê têkoşînê jî rojane li qadan nîşan didin. Ev hemû bi hev re ne tesaduf in. Hema bi carekê jî biryarên bi vî awayî nayên dayîn. Li ku derê çirûskên berxwedanê xuya bikin, hewl dide li vê derê bixe. Bûye weke mêşekî gêj ku dengê wî li ber guhan dibe sedema acizbûnê. Êdî nizane li ku bide û yekser cihên berbiçav hedef digire. Jinên ku li qadê dengê wan bilind dibe jî ji xwe re weke hedefeke hêsan diyar kiriye. Lê her carê ji bîr dike ku jin her çiqas êrîş bi ser wan de tên, hincetên berxwedanê jî mezintir dibin. Ew dibêjin me serkeftin li kolanan bi dest xist û em ê li kolanan biparêzin.

Di çalakiyên li dijî xwevekişandina Peymana Stenbolê de yekitiya jinan bi awayekî zelal derket holê. Hewldanên sînornîşandayîna hikûmetê jî ji vê yekê tê. Bûyera penaberên ji Îranê jî di nav van kiryarên hikûmetê de bal kişand. Ya balkêş ev e; ji ber ku vizeviza mêşê bêencam dimîne, jinên penaber tên hedefgirtin. Der barê 4 jinên îranî de ku bi hinceta tev li çalakiya Peymana Stenbolê bûne, biryara dersînorkirinê hat dayîn. Trajediya mirovahiyê ye. Ew aktîvîstên jin li welatê xwe jixwe bi mirinê re rû bi rû man û li ewlehiyê geriyan niha jî ji ber ku dengê xwe bilind kirin dewleta tirk bi rêyeke din cezayê îdamê li wan dibire. Dibe ku destê xwe yekser pê re qirêj neke lê dersînorkirin jî tê heman wateyê. Jixwe şîroveya îdamê diyar e. Qetilkirina fermî ya dewletê ye! Heke em niha careke din li rewşa heyî ya jinên herî dawî hatin binçavkirin û girtin binihêrin, aktîvîst çi li hundir çi li derve li ser lingan in û serî natewînin.

Ger em wan mijaran di tabloyekê de bînin cem hev, xwîn, tundî û mirin derdikeve pêş. Lê ger em bi çavek din lê binihêrin em, azadî, aramî, têkoşîn, demokrasî û berxwedanê dibînin. Ger em bi çavekî din li tabloyê binêrin serkeftina jinan ji niha ve xuya dibe. Wê tu êrîş ji li ber wan nebe astengî, ev tenê meseleya bijartinê ye. Ma belasebep nayê gotin her zayîn bi êş e, bêguman zayîna azadiyê jî ya herî bi êş û bi bedêlên giran e lê em ê ji bîr nekin emrê mêşan jî tenê di navbera 28 û 40 rojî de ye.






## Helwestên dijber li ber wê nebûn asteng

Ibtîhal Maqtof a 21 salî, di warê makyaja sînemayê û wênekêşiyê de, ji bilî hunera plastîkî, şareza ye. Hezkirina wê ya karê makyaja sînemayê wê ber bi pêşveçûnê ve dibe û behremendiya wê bi pêş dixe. Bi perwerde û fêrbûnê bi rêya kanalên Youtubê pêş ve dibe û tiştên ku fêr dibe jî dixe pratîkê.

Ibtihal Maqtouf a xwendekara Beşa Aborî û Zanista Siyasî ya Zanîngeha Trablûsê ye û ji bo bipêşxistina xwe piştgiriya tu kesî nedîtiye, got ku helwestên dijber li pêşiya wê nebûye asteng.

Ji aliyê din ve jina ciwan piştrast kir ku ew xwe bi xwe perwerde dike, ji bo çêkirina boyaxê ew madeyan li malê peyda dike û bi vî awayî hunera xwe bi pêş dixe.

Jina ciwan ku hewl dide xwe di vî warî de bêtir bi pêş bixe, wiha got: "Her çend civaka Lîbyayê timî hunerên xerîb ên wiha qebûl neke jî hêviyek min a mezin heye ku hunera ku niha dikim, bibe pîşeyek."

Her wiha Maqtof bang li jinên Lîbyayê kir ku ji bo pêkanîna xeyalên xwe li dijî hemû astengiyan bisekinin.

***TRABLUS***

# Di nav şoreşê de reqsa azadiyê

Elîf Can Alkan

Li ser rûyê erdê yanî piştî avakirina pergala mêran a di nav civakan de, tu civak nema ku rastî êrîşan nehatiye û beramberî van êrîşan tu civak jê nemaye ku şerê azadiyê nekiriye. Nemaze, di şerê azadiyê de ku civak li hemberî dagirkeriyê didin meşandin, tiştê ku bala mirovan dikişîne û li rûpela dîrokê tê nivîsandin, di nav şerê şoreşê de pêkhatina hin şoreşan e. Bi taybetî jî jin şerê çekdarî ji bo azadiya civaka xwe didin meşandin, her wiha di qadên cuda de jî şerê azadiyê geş dikin.

Yek ji van civakan jî gelê kurd e ku hê jî şerê azadiyê dide meşandin. Ev bi salan e gelê kurd, li her çar parçeyan, li dijî dagirkeriyê ji bo azadiyê şer dike. Di vî şerî de, di nav civakê de gelek guhertinên di asta şoreşê de pêk hatin û hê jî pêk tên. Bi taybetî jî jinên kurd, di nav şerê giştî de şerê cewherî jî pêk anîn. Jinên kurd nexasim di şerê azadiyê de, li hemberî hişmendiya civakê, ya ji aliyê mêran ve hatiye avakirin, şerê xwe yê herî mezin dike.

Nemaze piştî pêkhatina Şoreşa Rojava jinên kurd ketin rojeva cîhanê û navê xwe li dîrokê nivîsandin. Jinên Rojava ku ji aliyê leşkerî ve bûn rojev, piştre bi rêxistinbûn û çalakiyên xwe yên civakî bûn rojeva jinên cîhanê. Jinên Rojava piştî avakirina Rêveberiya Xweser, vê carê berê xwe dan pêkanîna şoreşa herî mezin ku misogerkirina şoreşa azadiyê ye. Yanî jinan berê xwe dan wê yekê ku di her qadê de rêxistinbûna jinan xurt bikin. Ji ber ku wan dizanibû, heta jin derveyî qada leşkerî di qadên din de neyên birêxistinkirin dê nikaribin azadiya xwe bi dest bixin. Di nav 10 salên şoreşê de jinan, di her qadê de xwe bi rêxistin kirin, bi vê rêxistinbûna xwe civakê guhertin û di cîhanê de bûn yek ji mînakên herî şênber.



Yek ji van qadan ku jinên Rojava û Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê xwe tê de bi pêş xistin, bi nêrîna xwe civakê guherandin, qada hunerê ye. Di qada hunerê de jin cihê xwe li herî pêş digirin, bi kar û xebatên xwe azadî û serkeftina xwe nîşan didin. Carinan bi helbestekê, carinan bi wêneyekê, carinan bi straneke, carinan bi reqsa xwe û hwd. şerê xwe yê azadiyê tînin ziman.

Di qada hunerê de mînaka herî dawî hefteyeke berê li Qamişloyê xuya bû. Li Qamişloyê jina bi navê Nazik Elî li kolanên ku ji ber vîrûsa koronayê vala bûbûn dansa baleyê kir. Dibe ev mînakek biçûk be, heta dibe ku li ber çavan neyê dîtin jî. Lê di nav şer û pevçûnan de nîşandayîna aliyekî jiyanê jî gelek girîng e. Bi taybetî jî nîşandayîna hunerê ya ku ji aliyê jinekê ve zehf girîng e.

Bi kurt û kurmancî tenê ev mînaka biçûk jî nîşan dide ku jinên Rojava, jinên şoreşê di nav jiyana civakî de jî bi reqsa xwe şoreşa xwe ya guhertina civakî pêk tînin.

**Reqsa jinên Şîliyê**

Li aliyekî din, divê neyê jibîrkirin ku beriya du salan jinên Şîliyê jî tundî, destdirêjî û tacîzên li hemberî jinan, bi reqsa xwe (Las Tesîs) şermezar kiribûn û ev reqsa jinan bû rojeva jinên cîhanê û raya giştî ya cîhanê. Piştî Şîliyê li gelek welatên din jî jinan bi heman permofmansê çalakiyên şermezarkirinê pêk anîbûn.



# Malbata Şenyaşar banga alîkariyê kir

Dayik Emîne Şenyaşar û kurê wê Ferît Şenyaşar ên zêdetirî mehekê ye çalakiya xwe ya nobetê ya li ber Edliyeya Rihayê bi daxwaza "Edaletê" dewam dikin, ji her kesî xwestin ku ji bo têkoşîna wan deng derxînin.

Emîne Şenyaşar a hevjîn û 2 kurên wê di êrîşa parazvan û xizmên parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz de hatin kuştin, bi kurê xwe Ferît Şenyaşar re çalakiyê li dar dixin. Ferît Şenyaşar, li ber edliyeyê axaftinek kurt kir û wiha got: "Em bi biryar in. Em bang li raya giştî dikin ku piştgiriyê bidin têkoşîna me ya edaletê. Em her roj di navbera saetên 08.00 û 17.00'an de li ber Edliyeya Rihayê di nobetê de ne. Em li ber avahiya Edliyeya Rihayê, li benda kemû kesên ne yên dixwazin serdana piştevaniya me bikin. Em dixwazin hemû kes ji bo têkoşîna me dengê xwe derxînin. Baweriya me bi edaletê nemaye. Helbet wê rojekê edalet bê bicihanîn."

Şandeyek ji nûnerên Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) a Amedê Mûrat Aba jî di nav de, bi armanca piştevaniyê serdana malbatê kir. Ferît Şenyaşar di dema serdanê de axivî û wiha got: "Dozger ji me re gotibû ku wan 23 kes tespît kirine. Wê demê ya pêwîst bikin, ma hûn li benda çi ne?" *RIHA*

# Dijminatiyê li kurdî dikin

Navenda Nûçeyan

**Dijberiya rayedarên dewleta tirk a li hemberî zimanê kurdî her tim xwe dide der. Wezîrê Perwerdeyê yê hikûmeta AKP'ê got ku destûrê nadin xebatên zimanê zikmakî. Qeyûmê ku ji aliyê AKP'ê ve hatiye tayînkirin li Farqînê tabelaya kurdî rakir û tabelaya tirkî bi cih kir**




Bêtehemuliya li kurdî ya qeyûmên ji aliyê dewletê ve tayînî şaredariyên HDP/DBP'ê hatine kirin didome. Beriya niha, qeyûmên li ser şaredariyên bajarên Bedlîs, Wan, Sêrt û Mêrdînê tabelayên pirzimanî rakiribûn li cihê wan tabelayên bi tirkî danîbûn. Li gorî nûçeya Ajansa Mezopotamayayê (MA) qeyûmê li ser şaredariya navçeya Farqînê ya Amedê, tabelayên pirzimanî (kurdî, îngilîzî, tirkî) yên li têketin û derketina navçeyê rakirin û li şûna wan tabeleyên tenê bi tirkî danîn.

**Tabelayên pirzimanî rakirin**

Beriya ku qeyûm tayînî şaredariya Farqînê bê kirin, hevşaredarên wê demê yên DBP'ê tabeleyên bi kurdî, tirkî, îngilîzî yên li ser "Hûn Bi Xêr Hatin Farqînê" nivîsandî li têketin û derketina navçeyê danîn. Lê piştî ku di sala 2016'an de qeyûm li ser şaredariyê hat tayînkirin, ev tabela hatin rakirin.

Roja 6'ê nîsanê bi fermana qeyûmê li ser şaredariya Farqînê Mûrat Ozturk li şûna tabeleya pirzimanî tabeleya tenê bi tirkî "Silvan'a Hoş Geldiniz" li têketin û derketina navçeyê hatin danîn. Li ser hesabê medyaya civakî yê qeymeqamiya Farqînê ji bo danîna tabelayan wiha hat gotin: "Ji aliyê Amed û Êlihê ve li têketina navçeya me, ji aliyê şaredariya me ve "Hûn Bi Xêrhatin Farqînê" xebata tabelaya bironî hatiye kirin."

**Hevşaradaran bertek nîşan da**

Li ser vê guhertinê, hevşaredarên Farqînê Naşide Toprak û Abas Hilmî Azîzoglû yên qeyûm tayînî şûna wan hat kirin, têkildarî mijarê axivîn. Hevşaradaran diyar kir ku tenê ne îro, bi salan e çand, huner û zimanê kurdî tune dihesibînin. Hevşaradaran bi bîr xist ku di nav salekê de 3 qeyûm hatine ser vîna gelê Farqînê û qeyûmên beriya niha jî Saziya Jinan a Meyayê, Saziya Ziman a Farqînê, Saziya Çand û Hunerê ya Zembîlfiroş bi destê qeyûman hatin girtin. Hevşarandar Toprak û Azîzoglû di dawiya axaftina xwe de ev tişt got: "Tevî ku gelê Farqîn ji sedî 100 kurd e, îro jî qeyûmê nû tabeleyeke ku yek peyveke kurdî tê de tune ye li navçeyê datîne. Ev tê wateya nenaskirina kurdan û zimanê wan. Em jî vê tunehesibandinê qebûl nakin û şermezar dikin. Em dibêjin pirzimanî, pirçandî û hebûna zimanê kurdî…"

## Bi îmzeyan bersivê bidin wezîr

Platforma Zimanê Kurdî jî bi daxuyaniyeke nivîskî bertek nîşanî helwesta Wezîrê Perwerdeyê Ziya Selçûk da û bal kişand ser kampanyaya ji bo zimanê kurdî û got: "Em Platforma Zimanê Kurdî bangî gelê xwe dikin; bi hemû hêza xwe, baweriya xwe, bi parastina mafê zimanê xwe beşdarî kampanyaya zimanê kurdî bibin. Em bi îmzeyên xwe helwesta xwe baş diyar bikin. Bila hemû kes baş bizanibin ku kurd bi zimanê xwe mafê perwerdeyê dixwazin. Bila hemû kes baş bizanibin ku kurd doza statûyeke fermî ji bo zimanê kurdî dikin. Bila hemû kes baş bizanibin ku zimanê kurdî hebûna me ye, nasnama me ye, rûmeta me ye! Em kurd mafê xwe yê ziman dixwazin!"

## Wezîr: Têkildarî zimanê zikmakî tu xebat nikare bên kirin

Parlamenterê HDP'ê yê Sêrtê Sidik Taş ji bo wezîrê Perwerdeyê Ziya Selçûk bibersivîne pirsname amade kiribû. Taş bi boneya 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî bi bîr xistibû û gotibû dikare li gel tirkî bi zimanê kurdî jî perwerdeyî were dayîn.

Her wiha Taş ev pirs jî kiribûn: "Ji bo pêkanîna mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî di bin banê wezareta we de kîjan xebat tên kirin? Wê mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî bikeve bin ewlehiya Destûra Bingehîn?"

Wezîr Ziya Selçûk wiha bersiv da pirsan: "Li saziyên perwerde û hînkirinê ji bo welatiyên tirk ji bilî tirkî tu ziman nikare weke zimanê wan ê zikmakî bê xwendin û hînkirin." Di berdewamê de jî Selçûk gotiye ku di mijara perwerdeya zikmakî tu xebat jî nikare bê kirin."

# Ne diyar e wê îsal qurbaniyên Enfalê bên bibîranîn an na!

Her sal 14'ê nîsanê 182 hezar welatiyên kurd ku ji aliyê rejîma Baasê ve di encama Enfalê de hatin qetilkirin, tên bibîranîn.

Yek ji van cihên ku her sal bi merasîman ev komkujî lê tên şermezarkirin û şehîdên enfalê tên bibîranîn, gundê Dêbne yê ser bi bajaroka Rizgarî ya navçeya Kelar a navenda îdareya Germiyanê ye. Lê ji ber behaneya vîrûsa koronayê ne diyar e wê îsal merasîma bîranînê lê were lidarxistin an na.

Rêveberê Rêveberiya Giştî ya Şehîdan û Enfalkiriyan a Germiyanê Cebar Omer der barê amadekariyên merasîmên bîranînê de ji Rojnews'ê re axivî û da zanîn wan ji Wezareta Şehîdan û Efalkiriyan daxwaz kirine bîranîn tenê bi danîna destê gulan pêk were û ti daxuyanî û çalakiyek din neyê lidarxistin.

Heta niha jî cenazeyên kesên ku di Enfalê de hatine qetilkirin, li çolên Iraqê tên dîtin. Malbatên qurbaniyan desthilata herêmê bi wê yekê tometbar dikin ku heta niha nekarîne cenazeyên qurbaniyan ji bo başûrê Kurdistanê veguhêzin. Niha jî gelek cenaze hatine dîtin, lê ji bo başûrê Kurdistanê nehatine veguhastin.

Der barê anîna cenazeyan de Cebar Omer da zanîn ew niha nimûneyên xwînê ji kesûkarên şehîdan werdigrin ji bo cenazeyan veguhêzin başûrê Kurdistanê. Gelek caran kesûkarên enfalkiriyan rexneya wê yekê dikin ku mûçeyên wan kêm in, li ser vê mijarê jî Cebar Omer da zanîn di dema xwe de maf û îmtiyazên kesûkarên enfalkiriyan hatine diyarkirin, lê xeletî tê de hatiye kirin. Cebar got ku wan hewil dane di dema serserastkirina yasayê de li parlamentoyê pirsgirêk were çareserkirin. *HEWLÊR*



## Greva birçîbûnê dewam dike

Navenda Nûçeyan

Girtiyên PKK û PAJK'î ku li dijî tecrîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin, nêzî 140 roj in li ber xwe didin. Çalakiya li Mexmûrê nêzî 120 roj in û ya li Yewnanistanê jî zêdetirî 100 roj in dewam dikin.

Rêveberên Rêxistina HDP'ê ya Bajêr a Amedê ji bo balê bikişîne ser greva birçîbûnê ya di roja 132'yemîn de li dijî tecrîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan li zindanan berdewam dike, li ber Abîdeya Mafê Mirovan ku li Parka Koşûyolûyê ye daxuyanî bide çapemeniyê. Rêbeverên HDP'ê, aktîvîstên TJA'yê, rêveberên DBP, TUAY-DER'ê û MEBYA-DER'ê jî bo daxuyanî bidin hatin Parkê. Polîsan rêveber dorpêç kirin û bi hinceta "pandemiyê, tecrîdê û piştevaniya ji bo girtiyan" destûr nedan daxuyaniyê.

Polîsan anonsa bêdestûriyê kir û rêveberan jî li dijî vê anonsê dirûşma "Bijî berxwedana zindanan" berz kir. Li ser vê yekê rêveberan çalakiya rûniştinê li dar xist û dirûşmên ji bo piştevaniya bi girtiyan re berz kirin. Di kêliya çalakiya rûniştinê de polîsan, rojnameger jî asteng kirin.

**Li Mêrsînê hevdîtinên gel**

Hevdîtina gel a bi şîara "Li dijî faşîzmê em xwe birêxistin bikin" a li Mêrsînê dewam kir. Şandeya ji hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk, hevserokên DBP'ê Salîha Aydenîz û Keskîn Bayindir, parlamenterên HDP'ê Fatma Kûrtûlan û Mûazzez Orhan û endamên partiyê pêk hat beşdarî hevdîtinê bûn.

Keskîn Bayindir diyar kir ku starta şerê li dijî kurdan ji girava Îmraliyê didin û wiha got: "Divê em li dijî faşîzm û yekperestiyê rêxistinbûna xwe mezin bikin. Em dikarin bi têkoşînê xetereyan bertaraf bikin." Endamê Dîwana Hevserokatiya KCD'ê Adnan Akgul jî bal kişand ser çalakiya greva birçîbûnê û wiha got: "Divê em daxwazên xwe yên demokratîk bînin ser ziman. Kurdan bedelên mezin dan. Lê çi dibe bila bibe, teqez wê kurd bi ser bikevin."

## SOZÊN XWE PÊK NEANÎN HÊVIYÊN GEL ŞIKANDIN

# Qedexe ne li gorî feraseteke zanistî ne

Navenda Nûçeyan

*Di vê dema ku dîsa li gelek deveran nexweşiya pandemiyê vîrûsa koronayê zêde dibe, me xwest ku der barê vê mijarê de bi Dr. Halis Yerlikaya re hevpeyvînekê bikin û agahiyên dawî yên belavbûna vê şewbê jê bipirsin.*

**Rewşa derziyê li cîhanê niha di çi astê de ye?**

Di hêla derzîkirinê (aşî) de, pirsgirêka sereke ew e ku hin welatên xizan hê jî derfet û delîveya derzîlêdanê qet bi dest nexistine, derzî qet neçûye ba wan. Welatên kapîtalîst yên wekî Amerîka û Ewropayê vê derziyê peyda kirin. Lê belê li cîhanê, li nêzî 52 welatan heta niha qet dozek derzî li nexweşan neketiye. Cudatî di navbera welatan de heye, hin welatên xizan ku rêjeya koronayê lê pir zêde bûye, nikarin xwe bigihînin derziyan. Ev pirsgirêkeke mezin e, ji ber ku ev pandemî dê di demeke nêz de neqede. Ji bo ku li hemû cîhanê pêşî li pandemiyê bê girtin, divê di navbera hemû welatan de piştgiriyek hebe. Her kes ji cîranê xwe jî berpirsiyar e.

Ji bo ku pêşî li Covîd-19'ê bê girtin, bi giştî ji bo cîhanê 14 milyar doz derzî lazim e. Ji bo vê jî divê ev patenta şîrketan a li ser derziyê bê rakirin û derzî ji bo her kesî be. Divê li hemû welatên cîhanê ev patent bê rakirin û çi xizan çi dewlemend hemû welat hînî çêkirina derziyê bibin. Lê ji ber ku îro patenta van derziyan di destê hin şîrketan de ye gelek kes nikarin xwe bigihînin derziyê.

Pandemî nexweşiyeke pergala kapîtalîzmê ye. Kapîtalîzm bixwe bû sedema pandemiyê, lewra; destwerdana hawirdor û ekosîstemê û ev şert û mercên ku derketin vê yekê piştrast dikin. Her wiha di vê çarçoveyê de, dibe ku di vê sedsalê de zêdetir pandemî çêbibin. Ji niha pê ve jî divê mirovahî li benda pandemiyan be. Di vê serdemê de mudaxeleyên li ser jiyanê û qadên dîtir ên mirovahiyê dê zêdetir bibin. Ji ber vê yekê divê mirovahî kumê xwe bide ber xwe û li ser vê rewşê baş bifikire, li gorî wê têbikoşe. Şîrketên ku derziyê dîtine qedera mirovahiyê kirine nav kefa destên xwe. Wan bi tena serê xwe ev derzî nedît helbet, dewletan piştgirî da wan. Dewletan bac ji gel distandin û bi vê bacê piştgirî dan wan şîrketan da ku ew derziya koronayê çêbikin. Baş e, derzî çima ne ji bo hemû gel e? Lê pandemiyê vê yekê jî da nîşan; xelasî û rizgariya yên dewlemend tenê, ji bo pandemiyê nabe çareserî, heke em bixwazin ji pandemiyê rizgar bibin divê her kes were derzîkirin.

**Di mijara derziyê de Tirkiye di kîjan merheleyê de ye?**

Rexneya me ya ewil ji bo rewşa Tirkiyeyê ev e: Tirkiyeyê pêvajoya pandemiyê di çarçoveyeke zanistî de nedaye meşandin û hê jî bi israr di çarçoveya zanistî de nêzî pêvajoyê nabe. Tirkiye tim wisa bû jixwe, ne li gorî ilmê, ne li gorî zanistê tevdigere. Lê Tirkiye yek ji wan welatan e ku bandora pandemiyê herî zêde li serê çêbûye. Ew reqamên ku duh derketin holê vê yekê piştrast dikin; di rojekê de 42 hezar kesên nû bi vîrûsê ketine. Her wiha heta niha 33 hezar kesan ji ber pandemiyê jiyana xwe ji dest dane. Lê em dizanin ku ev reqem jî ne rastin. Ji destpêka pandemiyê vir ve pêvajoya pandemiyê baş nehat birêvebirin.

Di hêla derziyê de jî gelek pirsgirêk hene. Ew tiştê ku wan digot û tiştên ku diqewimin berovajiyê hev in. Wan digot: Em ê di filan dîrokê de derziyan bînin, em ê evqasî derzî bînin, em ê gelê xwe zûtir derzî bikin lê hemû jî derew derketin. Bi vê yekê baweriya gel, hêviya gel hat şikênandin.

Ji tenduristiya gel zêdetir rewşa aborî xistin hincet û li gorî vê biryar girtin. Biryar bêtir di çarçoveyeke navendî de man, lê divê li gorî taybetiyên bajaran, rêjeyê û pêketiyan ev biryar bihataya girtin.

Heta niha li Tirkiyeyê 17 milyon û nîv derzî hatine lêdan, ji van 7 milyon û 300 hezar kes doza duyem jî bûne, 10 milyon û 200 hezar jî doza yekem tenê bûne. Bi temamî 17 milyon kesan derzî li xwe xistiye. Ev li gorî rewşa Tirkiyeyê pir kêm e.

Her wiha divê ne bi şîrketekê tenê re bi gelek şîrketan re xebat bihata meşandin û ji şîrketên cuda derzî bihata kirîn. Lê rewşa patenta ji bo Tirkiyeyê jî derbasdar e. Divê pêşî ev meseleya patentê rabe û dewletên mayîn bikaribin vê derziyê bi rehetî çêbikin. Ji ber ku di nav civakê de derzî dê pêşiya nexweşiyê bigire, divê herî kêm ji sedî 75'ê (%75) civakê derzî bibe. Lê em gelek dûrî van rêjeyan e.

**Li aliyekî din jî mijara qedexeyan heye. Tirkiyeyê ji destpêkê heta niha hewl da pêvajoyê bi qedexekirinan bi rê ve bibe, lê rêjeyên dawîn jî didin nîşan ku ev qedexe bi tena serê xwe bi kêr nayê. Hûn li ser vê yekê çi difikirin?**

Ev qedexeyên li Tirkiyeyê jî ne li gorî feraseteke zanistî ne. Divê reqemên bajaran, herêman li ber çav bihata girtin û bi tevlîbûna gel û saziyan ev pêvajo bihata birêvebirin. Ev biryar ne ji bo tenduristiya gel in. Diviya di vê pêvajoyê de, ji hêla aboriyê ve piştgiriya gel bihata kirin.



Ew reqamên ku dawî derketin holê vê yekê piştrast dikin; di rojekê de 42 hezar kesên nû bi vîrûsê ketine. Her wiha heta niha 33 hezar kesan ji ber pandemiyê jiyana xwe ji dest daye. Lê em dizanin ku ev reqem jî ne rast in. Ji destpêkê ve pêvajoya pandemiyê baş nehat birêvebirin

Ew cih û deverên qelebalix, wekî metropol, fabrîqe û kargehên mezin ku îhtîmala pêketina nexweşiyê lê zêde ye, ji hêla aboriyê ve bihatana rehetkirin, qet nebe li gorî wê gel bikaribûya tevdîra xwe bigire. Her wiha diviya, ew kesên xizan û kesên ku debara xwe rojane dikirin ji aliyê dewletê ve bihatana piştgirîkirin, lê tiştekî wisa çênebû.

Lê binihêrin di biryarên wan ên qedexeyan de, pêşî cihên wekî navendên dan û standinan (AVM) tên vekirin. Navendên dan û standinan vedikin lê parkan qedexe dikin. Halbûkî ev navend girtî ne û pergalên wan ên hewayê dibin sedem ku nexweşî bêtir li van deran belav bibe. Ev biryar jî nîşan didin ku armanc û feraseta sereke li ser berjewendiyên aboriyê ye. Ji ber ku aboriya Tirkiyeyê qels e xwe dispêrin van qedexeyan. Lê bi qedexeyan jî ev pêvajo nameşe. Qedexe jî ji xwe re kirin wekî amûrekê da ku pê hin polîtîkayên xwe bidin meşandin. Radibin kongreyan bi lepelep çêdikin, lê binihêrin ev kongre bûn sedema belavbûna nexweşiyê. Nexasim li bajar û navendên li Deryaya Reş nexweşî zêdetir bû.

**Rewşa derziyê ya li Kurdistanê di kîjan merheleyê de ye?**

Ser meselê; li Amedê 160 hezar derzî hatin lêdan, li Êlihê 58 hezar, li Wanê 103 hezar, li Mûşê 32 hezar derzî hatine lêdan. Li Rihayê 134 hezar derzî hatine lêdan. Riha bixwe yek ji bajarên herî mezin ên Kurdistan û Tirkiyeyê ye. Derzî li gorî gelheya bajaran hatiye lêdan, lê kêm e.

Destpêkê kesên temenê wan di ser 65'an re ye hatin derzîkirin. Lê li herêma me ev kes pir kêm in. Sedema sereke ya derzînebûna kesên temenmezin ev e: Baweriya wan bi polîtîkaya derziyê nayê. Ji ber ku sîstema tenduristiyê baş nehatiye birêvebirin, li herêmê ji sedî 50'yî (%50) gel naxwaze derzî bibe. Lewra pêvajoya pandemiyê û birêvebirina pêvajoyê di çarçoveyeke zanistî û zelal de nehat meşandin û vê yekê li ser gel baweriyek neda çêkirin.

Sedemeke esasî jî ew e ku xizmetên tenduristiyê bi zimanê zikmakî nayên dayîn. Heke xizmet bi zimanê gel bûya bêguman gelê me dê bêtir bi xwestek bûya.

Her wiha li herêmê di qadên dîtir de jî gelek kêm derzî hatine kirin; wekî ku tê zanîn destpêkê xebatkarên tenduristiyê hatin derzîkirin lê li herêma me rêjeya derzîkirina xebatkarên tenduristiyê jî pir kêm e. Aliyê din jî kesên ku nexweşiyên wan ên kronîk hebûn hatin derzîkirin lê rêjeya derzîkirina wan jî li herêmê pir kêm e.

**Çendek berê nexşeyek hat parvekirin, lê piştî rakirina qedexeyan di nexşeya bakurê Kurdistanê de jî guherîn çêbûn û rêjeya pêketiyan zêdetir bû. Gelo divê em vê nexşeyê çawa binirxînin?**

Ew nexşeya ewil ku bakurê Kurdistanê tê de bi rengê şîn hatibû destnîşankirin çend xalên girîng destnîşan dikin. Lewra me li herêma xwe bedeleke mezin da. Di havîna borî de nexweşî gelek zêde bû lê nekete rojevê. Rewşeke wisa bû ku me emeliyatxane û servîsên polîklînîkan hemû xistibûn servîsên lênêrîna awarte. Me ew bedel da jixwe. Îro meriv dikare bibêje ku li herêmê, hema hema di nav her malbatê de, mirin çêbûne. Ew rengê şîn ê nexşeyê ji ber şînên me yên demekê bû, ew nexşe bi mirinê derket holê. Lê dîsa jî em baweriya xwe bi wê nexşeyê jî nayînin lewra hejmarên ku ji teref wezareta tenduristiyê ve tên parvekirin ne rast in.


Niha wekî Odeya Bijîşkên Amedê û wekî Yekitiya Bijîşkên Tirkiyeyê em bang li gelê xwe dikin: Heke dora derziyê hat ser wan, bila teqez derziya xwe li xwe bixin. Em ê bi derziyê hem xwe, hem hezkiriyên xwe hem jî civaka xwe biparêzin. Hin kes dibêjin derziya Çînê ye ez pê ne bawer im û derzî nabim. Li gorî lêkolînên cîhanî û li gorî lêkolînên ku li Tirkiyeyê hatine kirin ev derziya ku niha Tirkiye bi kar tîne hem bi bandor e hem jî bandora wê ya neyînî pir kêm e.



## Halis Yerlikaya kî ye?

Diktorê Pispor Halis Yerlikaya di sala 1980'yî de li Pasûrê hatiye dinyayê. Di salên 2016-2017 li Amedê li zanîngeha Dicleyê di beşa onkolojiyê de pisporiya xwe kiriye. Di salên 2010-2012'an de li nexweşxaneya dewletê ya Agiriyê wekî pisporê nexweşiyên hundirîn kar kiriye. Di navbera 2013-2014'an de li Sêrtê li nexweşxaneyeke taybet kar kiriye. Niha li nexweşxaneyeke taybet a Amedê wekî pisporê onkolojiyê karê xwe yê diktoriyê didomîne.





Sîdar Jîr

# 'Hesar û kûçikên bavê min' girêgûtk* e!

Di bîra civakan de hin girêk hene, zû bi zû venabin û sîrayetî hemû qadên jiyanê dikin. Girêka Gordîonê jî li ber gelekî hêsan dimîne ku Skenderê Zulqirney ew bi derbeke şûr an jî bi ferman û peyman û biryarekê ji hev werin vekirin. Ew girêk kod in, kodên civakî ne. Lewma jî guherandina wan ji gelek aliyan ve zehmet e. Gelek caran di berhemên hunerî de guherandin û çareserkirina wan girêkan dijwartir e. Dîrok, psîkolojî, mîtolojî, civaknasî û gelek warên din ên zanistê jî nikarin bi carekê re wan girêkan çareser bikin. Belkî jî çareserkirina wan girêkan, bi awayê herî berfireh, mantiqî, felsefîk û dîrokî di berhemên edebî de tên vegotin. Heger ew girêk di berhemên edebî/hunerî de venebin, edî wekî *girêgûtkekê* dimînin ji demê re...

Di romana Şêrzad Hesen a bi navê ***'Hesar û kûçikên bavê min'*** de jî vekirina wê girêkê maye ji demê re...

Roman bi plansaziya kuştina bav anku bi kuştina pergala baviksalariyê xwendevên pêşwazî dike. Di ser kuştina bav û têkbirina baviksalariyê re, hilweşandinda pergala desthilatdariya heyî û dîktatoriyê vedibêje. Peyvên ku nivîskar wekî amûrên ji bo vekirina girêkê bi kar tîne jî wekî kelemên pergala dîktatoriyê hişk in; qamçî, xencer, xesandin, kûçik, gopal... Vebeyîna van gotinan a di civakê de bêguman tirs û xofekê dixe dilê mirov. Jixwe di wê hesara ku jiyanê li ehlên romanê teng dike de, leheng jî newêrek in... Kur dike û nake nikare, newêre nêzî bav bibe. Heta ku dêmarî hêzê didê û jê re dibe pişt, kur newêre tu tiştekî bike. Li vê derê, bi handana jina herî biçûk avê kurik, nivîskar rista jinê ya di hilweşandina pergalên tund û dîktatoryal de derdixe pêş.

Şêrzad Hesen, rewşa civakên bindest di wê hesarê de wekî merşeke reş li zemîna romanê raxistiye. Kûçik û cehş, bav û desthilatî/dîktatorî, jin û civak, tirs û wêrekî, ensestî, xesandina pisîkan, serdestiya mêrane û hwd gelek hêmanên din dikin girêgutkek li rêya guherînê were xistin. Şêrzad Hesen ev *motîfên* xwe bi awayekî ji awayan gihandiye pîskolojiyê û bi rewşa Oedipusî ve girêk lê xistiye. Di romanê de ol, şewhet, koletî di ser rewşa heyî ya jinê re hatiye vegotin. Desthilatdarî û dîktatorî jî bav e. Kur û jin di hilweşandina desthilatdariyê de wekî sembol û hêmayên bingehîn in.

Ji bo azadiya her kesî û bi piştgiriya jinbavê anku dêmariyê kur bavê xwe dikuje. Di rû de desthilatdarî û dîktatorî hildiweşe(!) Lê nivîskar di berhemê de, hilweşandinê wekî vekirin û çareseriya girêkê venabêje û wisa nîşan jî nade. Girêka herî dijwar bi hilweşandinê dide destpêkirin; avakirina piştî hilweşandinê yan jî pergaleke azadîhez. Ew girêk di romanê de bi tu awayî venabe. Ji demê re û ji xeyala xwendevanan re dimîne. Lê dirûvê avakirineke nû nayê ber çavên xwendevanan.

Di encama xwendineke hûrgilî de, Şêrzad Hesen bi hosteyî berê xwendevan dide vê yekê; hilweşandin hêsan e lê girêka dijwar avakirina piştî hilweşandinê ye!

***-Hesar û kûçikên bavê min, Şêrzad Hesen, 90 rp, Weşanên Dara, 2020***

***girêgûtk:** Girêka ku vekirina wê gelekî zehmet e.




# Di sedsala 21'ê de parastina zimanekî

Nuh Bozkur

Ziman amûreke ragihandina di navbera mirovan de ye û bêguman amûreke zindî ye. Mirov bi rêya ziman dikare hêmanên çandî û devkî (folklor) yên civaka xwe û bêguman hest û ramanên xwe veguhêze pêşerojê. Mirov dikare bi zimanê xwe henekan bike û xwestekên xwe bîne ziman. Hewcedariya mirovî bi zimanî heye, ji ber ku hewcedariya mirov bi hînbûn û axaftinê heye.

Li ser rûyê cîhanê zêdetirî 6 hezarî ziman hene. Lê belê li gorî hin pisporan nîvê van zimanan di dawiya vê sedsalê de dê tune bibin. Ziman dê tune bibin ji ber ku warê bikaranîna wan zimanan sînordar dibe ji hêla polîtîk, ekonomîk û zanyariyê ve. Ewil axêverên zimanekî dimirin û zarokên wan pêdiviyê pê nabînin ku bi zimanê xwe yê dayikê biaxivin. Li gorî zarokên wan îngilîzî, fransî yan jî çînî bikêrhatîtir in ji zimanê wan ên dayikê. Her çi qas ku ji bo kurdan tirkî bikêrhatîtir be jî, tirkî jî di bin bandora vê bişaftin û tunebûnê de ye. Her çi qas ku zimanekî serdest be jî li gorî kurdî, piraniya peyvên wî biyanî ne, ji ber ku sentaks bi tirkî ye ew peyv wek tirkî tên qebûlkirin. Anku tirkî jî di bin bandora îngilîzî, fransî û hwd de ye.

Ji bo parastin û jiyandina zimanan di sedsala 21'ê de, pêwîstî bi parastina dewlet û rêxistinên navdewletî  heye.

**Înternet û parastina zimanan**

Ji bo ku zimanek bijî, divê ne di bin tadeyî û polîtîkayên asîmîlasyonê yên dewletekê de bin û di jiyana rojane de bi awayekî aktîf bên bikaranîn. Wek mînak, zimanê bi navê 'adîge' ku tenê di du gundên Îsraîlê de tê axaftin, ji aliyê dewleta Îsraîlê ve tê parastin û di dibistanê de perwerde bi vî zimanî tê dayîn. Ji ber ku dewleta Îsraîlê polîtîkayên asîmîlasyonê nameşîne zimanê adîge, fersenda xweparastinê bi dest xistiye. Li dinyayê hin sazî û dezgeh dixwazin bi rêya medyaya civakî û înternetê zimanên di bin talûkeya tunebûnê de ne, biparêzin.

Pêşketina teknolojiyê jî vê derfetê dide. Bi rêya hin aplîkasyonan, wek mînak; zimanê cherokee yê ku zimanê herêma bakurê Amerîkayê ye û zimanê gwîch ê li Alaskayê tê axaftin ku tenê 400 axêverên wî hene û zimanê ayapaneca zimanekî herêmî yê Meksîkayê ye ku tenê du axêverên wî hene, bi vî rengî hatine parastin. Lê me di serî de jî gotibû, ziman amûreke zindî ye ku bi guherîna dinyayê re, bi pêşketina teknolojiyê û bi mirovan re diguhere.

**Axêverên resen û zindîkirina zimanekî**

Ev ziman her çi qas ku bi vê şêweyê hatibe parastin jî, em nikarin bêjin ew ziman hatine zindîkirin. Ji ber ku zindîkirina zimanekî pêdivî bi 'axêverên resen' (native speaker) heye. Ev axêver divê bi zimanê xwe perwerdeyê bibînin û di zanîngehan de bi awayekî serbest bikaribin bi zimanê xwe xebatên zanistî bikin. Bêguman divê ev ziman bibe ji zimanên fermî yên dewletekê jî. Hinek dewlet ji dibistana seretayî heta lîseyê derfeta perwerdeya zimanê dayikê didin. Lê dema ku zimanek di zanîngehan de cih negire, ev yek astengiyeke cuda ye ji bo zimên. Wek mînak gelê guaranî yê li Brezîlya, Paraguay û Arjantînê dijî, li herêma wan guaranî zimanekî fermî ye lê ji ber ku ev gel li Paraguayê dikaribin heta zanîngehê bi zimanê xwe bixwînin û li Brezîlyayê jî heta asta lîseyê dikarin bixwînin, di navbera gelê guaranî yê li Paraguayê dijîn û li Brezîlyayê dijîn de ji aliyê pêşveçûn û axaftina ziman de cudahiyeke mezin heye. Her çi qas gelê guaranî yê ku li Brezîlyayê dijî, daxwaza bikaranîna zimanê xwe li zanîngehê dike jî, ev ji aliyê dewleta Brezîlyayê ve nayê qebûlkirin.

Zimanek tenê bi fermîbûn û bikaranîna di perwerdeyên seretayî de jî ji tunebûnê nikare xilas bibe. Ji ber ku bikaranîna zimanan a li zanîngehan, di sedsala 21'ê de rê li ber bişaftinê jî digire. Loma ev zimanên ku bi rêya înternetê tên parastin, tenê hatine parastin lê belê nehatine zindîkirin. Zimanek  derfeta pêşketinê ancax di xebatên zanistî de dikare bibîne û wê çaxê dikare peyvên nû jî li xwe zêde bike. Her wiha cihgirtina di zimanên dîtir de jî girîng e, ji ber ku zimanek di zimanên din de jî dijî.

Kurd jî di welatê xwe de ne miletekî kêmar in lê ev sedsalek e asîmîlasyon bi awayekî sîstematîk tê meşandin, lê çima kurd hêj bi temamî asîmîle nebûne? Em dizanin ku heta salên 90'î jî rêjeya gelê kurd a li gundan ji ya li bajaran zêdetir bû û tê zanîn ku heta salên 70'yî jî gelê Heskîfê di şikeftên kelehê de dijiya. Ev jî tê wateya ku kurd dereng bajarî bûne. Di salên 1920'î de qedexeyên cil û bergên kurdî têkiliyên kurd û bajaran jî kêm kirine. Ev bûye ji sedemên herî girîng ên parastina zimanê dayikê lê sedema paşvehiştina miletê kurd e jî. Hişmendî hêzek e ji bo parastina nirxekî. Ziman jî nirxekî neteweyî ye. Ji bo rewşa kurdan hişmendiya parastina zimanê kurdî, tiştekî herî bikêrhatî ye, lê ne tenê wek hişmendiyeke neteweyî, hişmendiyeke zanistî jî divê. Tenê hişmendiya neteweyî di humanîzm û eksîztanyalîzma sedsala 21'ê de û fikra biratiya gelan û dirêjbûna têkoşînê ya di siyaseta me de, nahêle têrê bike anku naveroka vê têgihê pûç dike. Ji ber wê jî êdî gotinên wekî "heyran, qurban, zimanê me ye, nasnameya me ye..." bi kêr nayên. Divê ev mijar bi awayekî zanistî ji bo her kesî were ravekirin.

**Mînaka tirkiya amediyan**

Ziman girîng e, ji ber ku her ziman xwedî perspektîfeke nû ye. Parastina çanda civakekê ji bo veguhastina nifşeke nû, bi zimanê wê çandê pêkan e. Ev veguhastin gelekî xwezayî ye. Ger mirovek bikare xwe bi zimanê dayika xwe îfade bike ji aliyê derûnî ve tenduristir e. Ji aliyê derûnnasên zimên ve hatiye tespîtkirin ku li gel kesên bi zimanê dayika xwe mezin nebûne, pirsgirêkên xwemalîbûnê hene û ev yek jî nakokiyeke mezin e. Di xebateke Zanîngeha Wurzburgê de ku li ser pitikekî alman û pitikekî fransî hatiye kirin û ji cudahiya giriyana wan hatiye tomarkirin ku her zimanek xwedî melodiyeke taybet e û vê melodiyê ji bo axaftina bi zimanekî din jî bi kar tîne. Ev yek di tirkiya amediyan de jî kifş e.

**Nîvzimanî**

Zanîn vê dide nîşan ku bingeheke bi zimanê dayikê hêza fêrbûna zimanekî dîtir jî bilind dike, duzimaniyê pêkan dike, eger ev bingeh nehatibe avêtin pirsgirêka nîvzimaniyê derdikeve holê ku ev ji mirinê xirabtir e. Nîvzimanî, rewşa kêm zanîna zimanê dayikê û ji ber baş nezanîna zimanê dayikê nîvco zanîna zimanê serdest rave dike. Zarokên nîvziman ji ber ku nikarin xwe bi her du zimanan jî îfade bikin, serkeftina akademîk jî nikarin bi dest bixin. Bi kurt û kurmancî, mejiyê me wekî qufleke xwedî taybetmendiyên neteweyî ye û helbet mifteya wê jî zimanê dayikê ye.

Eger zimanek di bin polîtîkayên asîmîlasyonê de be, divê ew milet bi inyad be û zimanê xwe veguhêze nifşên nû. Heta çareseriyeke siyasî çêbibe divê zimanê xwe ji bo pêşerojê amade bike.





Xweşkanî

Felemez Ulug

# Rûreşiya Ewropayê

Hefteya borî serokê Konseya Ewropayê Charles Mîchel û seroka Komîsyona Yekîtiya Ewropayê Ursula von der Leyen li ser navê 27 welatên endamên Yekîtiya Ewropayê serdana Enqereyê kirin.

Serdana serokên Konsey û Komîsyona Yekîtiya Ewropayê, Charles Michel û Ursula von der Leyen di qada navneteweyî de ji gelek aliyan ve, bi nêrîn û perspektîfên cuda hat nirxandin. Lê mijareke sereke ya ku derket pêş, ji naveroka hevdîtinê zêdetir, bêrêziya li hemberî Ursula von der Leyen hat kirin bû.

Ew bêrêziya her du mêran a li hemberî Ursula von der Leyenê, di heman demê de, nêzîkatiya pergala ku nûnertiya wê dikin jî bi awayekî aşkera radixe ber çavan. Di vê hevdîtinê de careke din derket holê ku "demokrasiya Ewropayê" di bingeha xwe de çiqas şeklî ye û ji rejîmên mezojinî ne cudatir e. Lê mijara me ne bêrêziya li hemberî Ursula von der Leyen hatiye nîşandan e. Jixwe her du mêrên ku mohra xwe li vê bêrêziyê xistin, ji hêla hişmendiyê ve xwedî nêzîkatiyeke mezojinî ne. Em şaş û ecêbmayî nemînin.

Bêguman ev hevdîtina ku bi Erdogan re pêk hat, ji aliyê gelek kesan ve hat nirxandin û şîrovekirin. Lê di daxuyaniyan de jî ku der barê hevdîtinê de hatin dayîn, ji naveroka hevdîtinê zêdetir, li ser sedemên wê bûn.

Serokên Konsey û Komîsyona Yekîtiya Ewropayê ji bo nermkirina danûstandinên xwe yên bi rejîma Erdogan re pir tên rexnekirin û beriya vê hevdîtinê jî ev rexne êdî gihîştibûn radeyeke bilind. Bêguman di bingeha van rexneyan de, mijarên ku mafên mirovan û serweriya hiqûqê eleqedar dikin derdikevin pêş. Lê di rastiya xwe de, ji vê zêdetir, li hemberî tehdîdên Erdogan bêhelwestiya Yekîtiya Ewropayê tê rexnekirin.

Lewma di daxuyaniya piştî hevdîtinê de nirxandinên hatin kirin, ji bo van rexneyan bersiv bûn. Ji ber vê yekê jî her du serok, bi taybetî û bi dubareyî gotin ku mafên mirovan, demokrasiyê û hiqûq ji bo wan gelekî girîng e. Lê çi karên kesên wisa girîngiyê didin "mafê mirovan" li gel rejîmek wisa bi awayekî aşkera mafê mirovan binpê dike heye? Ji ber vê yekê hevdîtina bi Erdogan re hat kirin ne li ser binpêkirina mafên mirovan li ser mijarên ticarî û berjewendiyan bû.

Seroka Komîsyona Yekîtiya Ewropayê Ursula von der Leyen di daxuyaniyê de bal kişand ser girîngiya têkiliyên Yekîtiya Ewropa û Tirkiyê û got: "Ewropa dixwaze têkiliyên xwe bi Enqereyê re baş bike, lê hîn dem lazim e." Lê li ser rewşa mafên mirovan, serweriya hiqûq û demokrasiyê fikarên wan hene. Jixwe Ewropa ji fikar û gumanan wêdetir neçûye.

Ursula von der Leyen wekî mînakên van fikaran jî biryara dewleta tirk a vekişîna ji Peymana Stenbolê, dozên li siyasiyan hatine vekirin, pêkneanîna biryarên Dadgeha Mafên Mirovan û hwd rêz kirin. Bêguman hevdîtinên bi vî rengî gelek aliyên xwe yê siyasî jî hene. Nexasim welatên Ewropayê di vê mijarê de xwedî ezmûnek mezin in.



Berî hevdîtina bi serokkomarê Fransayê Emmanuel Macron re, hin lîderên Ewropayê bi rêya telefonê li Erdogan geriyan û li ser hin mijaran peyamên hevkariyê dan. Bêguman ev hemû amadekariyên hevdîtinan bûn. Ji ber ku rayedarên ewropî nedixwestin ji vê hevdîtinê dest vala vegerin diviya bû ku beriya hevdîtinê li hember aliyê tirk destê xwe xurt bikin. Ji bo vê jî mijara sereke ku dikaribûna li hemberî dewleta tirk bi kar bînin kurd bûn.

Lewma beriya çûyîna serokên ewropî ji bo Enqereyê êrîşên li ser sazî û rêxistinên kurdan ên li Fransayê bê sedem nebûn. Piştî Almanyayê, Fransayê jî bi van êrîşan ve peyamek da rêvebiriya Enqereyê. Jixwe hem rêveberiya Enqereyê û him jî YE bi zextên li ser kurdan peyaman didin hev û dilê hev xweş dikin.

Wisa diyar e ku her du aliyan tiştê ku ji vê hevdîtinê hêvî dikirin bi dest xistine. Lê bi vê hevdîtinê jî derket holê ku gotinên mîna demokrasî, mafên mirovan û serdestiya hiqûqê hemû ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin.

# Lobiyeke çawa pêwîst e?

Husên Omer

Ragihandin, xwepêşandan, hewar û gazî êdî tu bandora wan li ser biryarên serok û rêveberên cîhanî tune ye. Ragihandin dikare bandorê li şopdarên xwe bike.

Gerek were zanîn ku piraniya serok û rêveber, parlamenter û dîplomatên cîhanê haya wan ji ragihandina televizyonan û rupelên rojnameyan tune ye û ne jî di netê de li tiştekî digerin.

Serê sibehê kaxizek tê ser maseya wan, an jî peyamek tê emailên wan û tê de behsa kurtahiya nûçeyên ku ji wan re girîng in tê kirin. Tiştên ku li Sûriye, Kurdistan û Iraqê dibin ne di nav nûçeyên ji bo wan girîng de negiringî bûyeran li ba wan girêdayî berjewendiyên wan yên ramyarî, aborî û civakî ne.

Bizanibe eger tu milyonek rapor der barê binpêkirinan de bi rêya ragihandinê belav bikî, kesek ji bilî piştgir û alîgirên te wan nabîne û ew agahiyên te bala kesekî din nakişînin.

Lewre divê aliyê ku bixwaze dengê xwe bigihîne wan rayedar û rêveberên cîhanî divê ku peymana xwe bi nivîsgehên têkiliyên giştî re çêbike da ku raporên wan bigihin aliyên cîhanî yên peywendîdar. Ne wiha be raporên Tirkiye, Qeter û tundîparêzên îtîlafê ji wan re dişînin, ew dê li ber çavên wan bin û dê wan raporan wekî bingeh û esas bigirin û biryarên xwe li gorî wan agahiyan bidin, wekî çawa ku niha dibe.

Rojava û Rêveberiya Xweser di vê çerxê de bi astengî û pirsgirêkên mezin re rû bi rû ye. Ji her aliyî ve şerê wê tê kirin ku ev ezmûn û tecrûbeya heyî bi ser nekeve.

Wek ku tê şopandin rêveberiya Rojava di hêla avakirina têkiliyên mayinde de yên bi rayedarên cihanî re ne çalak e. Ger mirov vegere dan û standinên wan bi berpirsiyarên welatên wekî Fransa û Swêdê re, heya niha Fransa piştgiriya çeteyên girêdayî Tirkiyeyê dike, alîkariya saziyên ku binpêkirinên li dijî mirovahiyê li Efrîn û Serekaniyê pêk tînin dike. Her wiha Swêd û Amerîka jî bi wan re alîkar in. Sedem ew e ku ew saziyên bi navê mafê mirovan kar dikin û ji hêla Tirkiye û Qeterê ve tên birêvebirin û Yekîtiya Ewropayê û Amerîka wan fînanse dike. Her wezîfedarekî di wezareta karên derve de der barê pirsgirêkên Rojhilata Navîn de raporên xwe yên heftane, mehane dişînin. Lewma bi derew û dijminatiyê hêzên kurd ên herêmî li ber çavên raya giştî reş dikin. Mixabin beriya çend rojan, dostek min bi rayedarek Amerîkî re têkilî danîbû û jê re behsa binpêkirinên tirkan li herêmên dagirkirî kiribû, bersiva rayedar jê re wiha bû: "Ma tu rastî dibêjî, tirk ewqasî li dijî mafên gelê herêmê binpêkirinan dikin, em terzê ku tu dibêjî nû dibihîzin."

Ev tê wateya ku hevdîtineke heyetekê bi serok an jî dîplomatên welatekî re nayê wê wateyê ku ew welat dê piştgirî û alîkariyê bide we, her wiha piştgirî û hevkariya welatan bi rêya çend dostên di nav rêveberiyekê de jî naçe serî. Bêyî ku her tişt bê raporkirin û were şandin, ji her rayedarekî ku bi pirsgirêkên herêmê re mijûl dibe wê bê encam bimîne.

Heke aliyek bixwaze ku sûdê ji wan têkiliyan bigire, divê têkiliyên xwe, bi lobiyên wan welatan ên ku dê ji vê têkiliyê sûdê bigirin, deyne. Dema ku di vê têkiliyê de feydeya wan lobiyan hebe dê zextê li hikûmetên xwe bikin da ku tiştên hevalbendên wan dixwazin pêk were. Bêguman ew dê ji bo berjewendiyên xwe vê yekê bikin.

Heke ne wiha be ev têkilî dê heta cihekî piştgiriyeke hestiyarî bi we re bike lê nagihe wê astê ku biryaran li gorî armanc û berjewendiya we pêk bînin.

Bi gotineke din ji bo ku armanca te pêk were divê berjewendiya wê lobiyê li ber çavan were girtin. Ew dê tu carî alîkarî û piştgiriya te nekin û zextê li hikûmeta xwe nekin dema ku ew armanca te ne li gorî berjewendiyên wan be û ew jî sûdekê jê negirin.

Aliyekî din ê girîng di van têkliyan de ew e ku berjewendiyên neteweyî di ser yên partîtî re werin girtin. Lê bi qasî wan astengî û zehmetiyên derve yên hundirîn jî hene. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan jî divê li her bajarekî heyeteke ji çend kesan pêk were ku gel bikaribe gilî û gazinên xwe bigihîne ber destê wan û mehê carekê ew heyet tev li hev bicivin û pirsgirêkên gel tevan ji rêveberiyê re pêşkêş bikin, da ku rêveberî bikaribe baş wan pirsgirêkan tesbît bike û rêyên çareseriyê ji wan re peyda bike.

# Ji bo berjewendiyan xwe kor dikin

Navenda Nûçeyan

Hêzên navneteweyî tim bi tirsa 'Tirkiye dê berê koçberan bide Ewropayê' dijîn. Ji ber vê yekê jî hikûmeta AKP'ê di her qadê de hem li hundir hem jî li derveyî Tirkiyeyê êrîşên xwe didomîne. Bi vî awayî ji Yekîtiya Ewropayê heta hemû hêzên navneteweyî li hemberî bêhiqûqî, nijadperestî û hemû zextên hikûmeta AKP-MHP'ê tim bê deng in. Her wiha li gel hemû êrîşên dijmirovahiyê jî bi hikûmetê re hevdîtinên xwe didomînin.

Di hefteya borî de seroka Komîsyona Yekîtiya Ewropayê Ursula von der Leyen û serokê Komîsyona Yekîtiya Ewropayê Charles Mîchel, serdana Enqereyê kiribû û bi Erdogan re civiyabûn. Serdana YE'yê ya di mijara koçberan de tawîz daye Tirkiyeyê, wekî dîplomasiyek nebaş hat nirxandin û bû rojev.

**Ursula von der Leyen**

Di hevdîtina bi Erdogan re ku Charles Mîchel li ser kursî rûnişt û dîsa seroka Komîsyona YE'yê Ursula von der Leyen jî li ser lingan ma, piştre jî li pêşberî wezîrê karê derve li ser qenepeyê da rûniştandin. Ev helwest di gelek weşanan de rê li ber nerazîbûnên tund vekirin û weke 'sofagate' ango 'skandala qenepeyê' hat vegotin. Di vê nêzîkatiya serokomarê tirk de jî xuya dibe ku dewlet di karên dîplomatîk de jî bi feraseta xwe ya 'zilamî', 'mêrane', kevneşopiyeke baviksalar tevdigere.



**Berteka serokwezîrê Îtalyayê**

Serokwezîrê Îtalyayê Marîo Draghî ê di daxuyaniyeke çapemeniyê de axivî û diyar kir ku heqaretek mezin li seroka Komîsyona YE'yê hatiye kirin. Draghî destnîşan kir ku Erdogan dîktator e û got: "Divê seroka Komîsyona YE'yê navê rast li van bike, bi vê nêzîkatiya ku bi van dîktatoran re rû bi rû mayî, xemgîn bûm."

**Tîr jî dikin, ren jî dikin**

Mario Draghî di hevoka duyemîn de wekî ku bi ser hişê xwe ve were û hesabê berjewendiyên bi bîr bîne û got: "Di mirov nav li têkliya bi kesên wiha re bike lê mirov neçar e ku bi wan re di nav têkilî û kordînasyonekê de bixebite. Her wiha Erdogan yek ji wan kesan e ku divê mirov pê re di nav têkilî û koordînasyonê de bimîne û ne wiha tenê heta divê mirov tevkariyê pê re bike ji bo berjewendiyên welatê xwe. Lewre divê di van têkliyên wiha de hevsengiyek hebe."

## Êrîşên li ser Şehbayê didomin

Êrîşên Tirkiyeyê yên li ser bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (Rojava) di meha nîsanê de jî didomin. Artêşa tirk û hêzên girêdayî Tirkiyeyê gundên girêdayî kantonên Şehba û Efrînê beserûber topbaran kirin. Di êrîşan de malên sivîlan zirar dîtin. Heta niha bi tu awayî têkildarî êrîşên dewleta tirk ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji dewletên navneteweyî bertek nehatine nîşandan. Ev bêdengî jî dike ku rêya êrîşan hê zêdetir li ber Tirkiyeyê veke. ***ŞEHBA***

## DYA dê hin leşkerên xwe ji Iraqê vekişîne

Bi serokatiya Wezîrê Derve yê Amerîka Antony Blinken û hempîşeyê wî yê Iraqê Fuad Hisên, tora sêyemîn a diyaloga stratejîk a Iraqê pêk anîn. Di daxuyaniya hevbeş a her du wezîrên derve de hat piştrastkirin ku dê li hember serweriya Iraq û aştiya axa wê rêzdar bin. Li gorî daxuyaniyê, Amerîka li ser vekişîna hêzên xwe yên li Iraqê mayî, erê kiriye. Lê berdevkê Pentagonê John Kirby diyar kir ku der barê vekişandinê de tu dîrok nehatiye diyarkirin. Her du aliyan li ser xurtkirina hevkariyê û aboriyê teqez kirin û niyeta xwe ya berdewama hevkarî û koordîneya ewlehiyê nû kirin. Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku hêzên Amerîkayê yên li Iraqê mane, bi banga Bexdayê ji bo piştevaniya ewlehiya Iraqê hatine. Iraqê diyar kir ku ew girêdayî parastina hêzên Koalîsyona Navneteweyî û avahiyên wê ne. Washingtonê aşkera kir ku ew tenê ji bo piştevaniya Iraqê ya di şerê li dijî DAIŞ'ê de li wî welatî ne. ***BEXDA***

# 'Rêveberiya Şengalê qanûnî ye'

Navenda Nûçeyan

**Bi mehan e gelê Şengalê li dijî peymana Bexda û Hewlerê li ber xwe dide. Parlamentera Iraqê Yûsra Receb ku çû serdana şengaliyan, diyar kir ku rêveberiya Şengalê li gorî qanûna Iraqê ye**

Hikûmeta Iraqê û rêveberiya PDK'ê bi berdewamî gefan li ser Şengalê dixwin û bi hewldanên desteserkirina rêveberiya Şengalê radibin. Di navbera hikûmeta Bexdayê û rêveberiya PDK'ê de di 9'ê cotmeha 2020'î de peymanek hatibû danîn û bi vê peymanê dihat xwestin ku Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Şengalê, heta 1'ê nîsana 2021'ê, bi hemû rêxistinbûyîna, xwe fes bike.

Di nav raya giştî ya kurdan û cîhanî de ev peyman rastî bertekên tund hatibû û biryara peymanê hatibû şermezarkirin. Meclisa Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Şengalê ragihandibû ku dê li beramberî êrîşên li ser herêma Şengalê bên kirin heta dawî li ber xwe bidin û nehêlin destkeftiyên wan ji dest biçin.

Di vê pêvajoyê de gelek kes û komeleyên demokratîk serdana rêveberiya Şengalê kirin û li dijî peymanê piştgiriya xwe anîn ziman. Berpirsiyarê Têkiliyên Derve yê Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Şengalê Faris Herbo der heqê rewşê de axivîbû û diyar kiribû ku berxwedana civaka êzidî ya Şengalê û êzidiyên li derveyî welêt û helwesta civaka kurd bû sedem ku pêvajoya dagirkirina Şengalê were rawestandin.

**Berdewama fermana DAIŞ'ê**

Di heyama birêvebirina Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Şengalê de, gelek şengaliyên ku ji ber êrîşên DAIŞ'ê neçarî penaberiyê bûbûn vedigeriyan nav mal û welatê xwe. Tevî ku peymana tesfiyekirina rêveberiya Şengalê bû rojev jî vegera şengaliyan berdewam dike. Şengaliyên ku vedigerin warê xwe li dijî vê peymanê derdikevin û peymanê wekî berdewamiya fermana DAIŞ'ê dinirxînin.

**Piştgiriya rewşenbîran girîng e**

Ji dema tasfiyekirina rêveberiya Şengalê bû rojev û heta îro, gelek şandeyan jî serdana Şengalê kir. Şandeyek ji rewşenbîrên başûrê Kurdistanê, ji Silêmaniyê, serdana Şengalê kir û piştgiriya xwe ya ji bo berxwedana gelê Şengalê bi lêv kirin. Li ser navê şandeyê, endamê şandeyê Aso Kosarî bi ajansên herêmî re axivî û destnîşan kir ku heta niha gelek komkujî bi serê gelê êzidî de hatine û tu hêzekê piştgirî û parastina gelê êzidî nekiriye û wiha got: "Gelê êzidî li ser vê yekê bixwe biryara xweparastin û xwebirêvebirinê daye. Girêdayî vê yekê pêwîst e ku hemû kurd, nemaze jî rewşenbîr, çalakvan û kesên demokrat piştgiriya gelê êzidî bikin."



Gelê êzidî li dijî biryara dagirkirina Şengalê li çiyayê Şengalê dest bi çalakiya nobetê kiribû. Gelê Şengalê bal kişandibû ser aramiya ku li Şengalê serwer e û diyar kiribûn ku dê li hember hemû gefxwarinan berxwedana xwe xurtir bikin.

**'Xweserî mafê rewa yê êzidiyan e'**

Parlamentera Iraqê Yûsra Receb têkildarî biryara peymana hikûmeta Iraqê û PDK'ê, li Şengalê bi heyetekê ve serdana konê çalakiyê kir û diyar kir ku li gorî qanûnên Iraqê mafê gelê Şengalê heye ku bi rengekî xweser bijî û xwe biparêze. Konê çalakiyê yê ku bi dirûşma "Em hemû Asayîş in" li dijî lihevkirina ku di navbera Tirkiye-Iraq-Hewlêrê de hatibû vekirin daxwaz û armancên xwe ji heyetê re ragihand. Receb bal kişand ser daxwazên gelê êzidî û diyar kir ku berxwedana gelê êzidî hemû plan û peyman têk birine û ev tişt an ziman: "Gel dixwaze Şengal xweser be û ev daxwaz jî li gorî qanûnên Iraqê di cih de ye. Ji ber ku ji xêncî hêza wan a leşkerî tu hêz nikare wan biparêze mafê wan heye ku xwedî hêzekê bin. Ez bixwe jî piştgiriya van daxwazên rewa dikim."

Yûsra Receb hewldana destwerdana hêzên derve yên li ser Iraqê bi bîrxist û wiha pê de çû: "Divê hikûmeta Iraqê bala xwe bide ser jinûveavakirina Şengalê. Ji bo ku hêzên derve dest li karên navxweyî yên Iraqê wernedin pêwîst e em hin pirsgirêkên xwe di nav xwe de çareser bikin."

**PDK zextan li Iraqê dike**

Gefên dagirkeriyê yên li ser Şengalê hê jî berdewam in. Serokwezîrê Herêma Federal a Kurdistanê Mesrûr Barzanî di civîna lijneya wezîran de der barê budçeya herêmê de axivî. Her wiha Barzanî di axaftina xwe de behsa peymana Şengalê jî kir û wiha got: "Digel hemû hewldanên me, ji ber astengkirina hin aliyan Peymana Şengalê nehat bicihanîn." Aliyê peymana dagirkerî û tesfiyekirina Şengalê PDK'ê bi vê helwesta xwe cardin destnîşan dike ku rêveberiya PDK'ê der barê bicihanîna peymanê de zextan li hikûmeta Iraqê dike. Wekî tê zanîn piştî ku mohleta hikûmeta Iraqê û PDK'ê ji bo peymana Şengalê dabûn qediya, hikûmeta Iraqê budçeya ku ji bo başûrê Kurdistanê veqetandibû aşkera kiribû. Ev yek dide nîşan ku aliyên peymanê di çarçoveya berjewendiyên xwe de li ser tasfiyekirina Şengalê li hev kirine.



Destar

Ehmed Pelda

# Zarokên me ji dest diçin!

Em bi destê xwe zarokên xwe radestî dewletê dikin.

Û vedigerin dibêjin çima zimanê me bi kar naynin. Xwezî tenê mijar ziman bûya. Ziman bi hêsanî tê fêrkirin û kêmasiyên wê bi demajoyê re vedigerin. Lê rewşa heyî wê xerabtir e. Dema ku em bi kêfxweşî zarokên xwe dişînin dibistanê wî radestî dewletê dikin. Ziman, kultur, tore, urf û edet, qewlê rabûn û rûniştinê, şêwaza jiyanê, hêvî û armancên pêşerojê her tişt, lê her tişt li gorî kêf û daxwaziya dewletê tê sazkirin. Heke zarok wek bi bedena xwe, termê xwe zarokê me jî, ji hêla derûnî, bi dil û can xwe aîdî dewletê dibîne.

Lê belê em wekî malbat, cîran, qewm û lêzim, êl û eşîr, hemşehrî, gundî û bajarî cîvatek in. Çanda me, danustandinên me, bazirganî û aboriya me, karûxebata me bi hev re ye. Gava êşek, birînek, mirinek çêbibe, yekser em diçin hawariya hev, destekariya hev dikin, dilê şikestî germ dikin.

Carinan şer û doz, nerindî û nebaşî, êş û xerabî pêk tên, dîsa em destekariyê didin hev wê neçêyîyê ji xwe dûrdixin. Urf û edetên me, tecrûbeyên bi hezaran salî givîrîne, him jî bi devkî ji qanûn û makezagonên dewletan mihkemtir û zexmtir in.

Mixabin niha hemû taybetiyên me niha bêkêr û betal in. Çerxa zimanê me, çanda me, civaka me şikestiye. Hişê me yê xwedan zêna berfireh ku dikaribû her tiştî kom bike û bi devkî pêşkêş bike, niha wek kêra ko bêkêr maye. Ne analîz, ne pêşbînî, ne hesab û ne jî milê civakê maye.

Rêya fikrê, pêşbiniyê ewqasî hatiye tengkirin ku bê pirs û bersiv her kes wê bendê ye ku zarok heke biçin dibistanê û bi ser bikevin, malbatê jî bigihêje armanca xwe. Her tişt li gor vê hatiye sazkirin.

Berî her tiştî, divê em ji bîr nekin, zarokekî dûrî civaka xwe mezin bibe ji hêla derûnî ve qels mezin dibe. Daxwaz û azweriyên wî yên jiyanî dimirin, da ku ji dûrmayîna civakîbûnê zarokan bê armanc dike û bêhêz dihêle. Perwerdeya dibistanî navgîneke teknîkî ye. Lê civaka ku dirûv dide kesaniya zarok bingeh e. Ev ji malbatê dest pê dike, cîran, hevalbendên lîstikê, lêziman û hevalên karûxebatê berdewam dike. Zemanê berê zarok ji hêla perwerde, karûxebatê bi malbatê ve girêdayî bûn. Di jiyana gundan de mamoste dê û bav bû. Zarok biçûyana xwendina medreseyê jî vedigeriyan malê û bi malbatî birayara pêşeroja xwe didan.

Lê di pergala îroyîn de her kes zarokên xwe radestî dibistanê, qursan û kargehên nenas kirine. Li gor encama xwendina zarok, an jî hînbûna pîşe pêre kar tê peydakirin. Ev hemû li derveyî îradeya malbatê diqewimin. Heya bigire malbat jî dibe destekarê vê çerxê.

Destdayîna hev a malbatî, yek kirina yan jî ahengdanîna planên malbatê û zarokan, çarenûsa hevalbendî û piştevaniyê têk çûye. Malbat wek komek, tîmek bû. Niha, gava zarokên xwe radestî dewletê dikin, biryara diyarkirina ziman, kultur, sinc, bawermendî, zanist, ango her tiştê der barê amadekarî û perwerdeya zarokan pêşkêşî dewletê dikin.

Dewlet hêzeke siyasî ye. Rêxistin û sazûmaniya wê heskî bi riya dînî, heskî bi riya sekûleriyê be li gor hin bawermendiyan hatiye avakirin. Dewlet jî wek organîzmayeke zindî civaka xwe, xebatkarên xwe amade dike. Zarokên berdest jî li gor armancên xwe dîzayn dike. Ku di bin banê dewletê de kargehên civakî, taybetî, saziyên kulturî, dadwerî, komel û partiyên girêdayî hin beşên civakê û hwd hemû li gor çarçoveya dewletê dirûv digirin û dimeşin.

Zarokekî di nav destê dewletê de mezin be, êdî ji malbata xwe îltîmas nake. Malbatê paşdemayî, nezan, bêkêr dibîne. Piştî gihîştin û kemilandinê jî ji malbatê venagere. Li pey wê ye ku zûtirîn ji malbatê veqete û biçe.

Planên kar û pêşerojê jî girêdayî pîşe, destkeftiyên bi riya xwendinê ne. Zarokek heke biçe zanîngehê yan jî saziyeke huner û pîşe hîn bibe li gor wê li kar digere, yan jî karekî saz dike. Li vir rola malbatê êdî gelekî kêm e. Malbat jî dîsa li gorî vê tevdigere. Piştî destpêka pîşeyê, mezinbûn û ciwanbûn û kardîtin dibe armanc. Di ber re zewac, bicihbûna xaniyekî ya bûk û zava re û pê kêfxweşbûn tê. Ev plansaziya takekesî ye. Ew keç û xortên bizewicin û bixebitin her planên wan tenê li gorî wan her duyan e.

Lêbelê divê sazûmanî, hevgirtin, piştevaniya malbatî an go civakî hebe. Civata malbatê heke dest bide hev dikare zêdetir pere jî qezenc bike, sermayeya xwe xurt bike. Lê ya girîngtir dikarin ziman, çand, siyaset, civakîbûn gelê xwe, destekariya berfireh jî xurt bikin. Ev jî zindîbûnê, hezkirinê, hestên komelî bi pêş dixe, ji hêla derûnî, aborî, toreyî û takekesî ve serkeftinê tîne.

Di rewşa îroyîn de, belê, malbat zarokên xwe dişînin xwendinê û hewil didin ji hêla aborî ve alavên wan peyda bikin û şert û mercên baş amade bikin. Lê divê ji bîr nekin: dê û bav an jî mezinên li mal heyî, her yek ji wan rêber, mamoste ne. Rast e barê wan giran e, lê hewce ye ku zarokên xwe ji bo hevgirtinê, destekdayîna hev, plansaziya tevahî hîn bikin. Kultur, çand, ziman, hunera xwe bidin hînkirin. Li ba wan nîn be jî sazî û dezgehên xizmeta vê armancê bikin bibînin, saz bikin û destekariya zarokan bikin.

Bi vê sayê dikarin zarokan ji dewletê biparêzin. Tiştên ku li wir hîn bibin, divê malbat jî bizanibe, lewma li zarokan bipirsin, wan zanînên çê tev li zanîn û tecrûbeyên malbatê bikin, yên xerab jî bi şêwazeke yekta ji zarok dûr bixin. Lazim e zanîn û kultura malbatê jî bi pêş bixin. Zarokên di malbatekê de bibin endezyar, aborînas, mamoste … yek bi yek ji malbatê veqetin biçin tu carê têkiliyek wan û malbatî namîne. Her yek jî ji hêla xwe ve qels û bêkêr dimîne. Lê heke li ba hev bin, piştgiriyê bidin hev. Her yek tiştekî hînî hev bike, çand, kultur û qezenca aborî wê xurt bibe. Wê bi nas û dostên xwe re jî bibin mînak. Bi vî awayî jî layiqî pesindayînê bin. Her wiha yekitiya malbatî, civakî û zengînbûn jî bi hev re tê. Di navbera mezinan, nifşên berê û yên nû jî ji veqetan çênebe.

Ji bîr nekin zengîn zarokên xwe sermayeya xwe bi hev re kom dikin. Zarokên xwe dişînin welatên cuda zanîngehên pêşketî didin xwendin. Lê di dûmahîkê de tînin li ser karê xwe an jî karekî nû bi destê wan vedikin û ew bixwe jî diçin balê (gel wan).

Lê feqîr an jî malbatên bêplan jî zarokên xwe yên têr û tije, yeko yeko dişînin xizmetkariya wan.

# Di dîroka îslamê de bêpergalî 2

Emîn Dilsoz

Bi rastî mirov dibêje qey dîroknasî bi awayekî aşkera bi Cemaleddîn Afganî dest pê kiriye lê gava mirov baş bala xwe bide dîrokê, mirov bi awayekî zelal dibîne ku di wê dema kurt a Hz. Muhammed pêxembertî ragihandî de jî xuya dibe û mînak hene. Wek nasix û mensux; ev yek hinartina hukmekî demkî ango hukmek tê di demekê de pêdivî bi wî hukmî namîne, ew hukum radibe yan diguhere. Her çiqas ev kiryar hemû beşên olê û alim li ser ne hemfikir bin jî li ser vê yekê gengeşî hebin jî, rewş û dîroka îslamê vê yekê wek hewcetiyek dîrokî dide diyarkirin. Em dikarin çend mînakan ji dema Hz. Muhemmed bidin. Wek me diyar kir nasix û mensux li ser yekitî tune be jî ayet û tevgerên Hz. Muhemmed ên bi vî rengî hene.

**Çar astên nesixkirinê**

Sereya Baqarayê ayet 106; "Her çi ayetek ji qur'anê heta ku em ji wê çêtir an jî mîna wê neynin, em hukmê wê ayetê ji rewacê ranakin û em wê bi te nadin jibîrkirin. Ma tu nizanî ku bêguman xweda li ser her tiştî qadir e." Li gor vê ayeta pîroz di qur'anê de nesix ango rakirina hinek hukman heye. Ev nesix bi rastî gelek gengeşî li ser hene, lê bi giştî nesix tên pejirandin. Eger nesix bê pejirandin çar astên wê hene:

**1-** Ayeta pîroz bi ayetê tê nesixkirin ango tê rakirin.

**2-** Sinet bi sinetê tê rakirin an guherandin.

**3-** Ayet kirinên pêxember ango sineta pêxember nesix dike.

**4-** Sinet ango pêxember bi kirinên xwe hukmê ayetê radike.

Ev yek ji pirtûka; nasix û mensux nivîsa Qadî Ebûbekir Muhemmed bin Ebdullah bin Muhemmed bin Ebdullah bin Erebî Malikî e (wefat 543).

Miro dikare li gor vê ayeta pîroz dîroknasiyê bipejirîne di demeke kurt de (23 sal) rêbaza olî guherîbe bi derbasbûna hezaran salan çawa mana li ser heman rewşa berî hezaran salan ferz be û neguhere ev yek di dema Hz. Muhammed de pêk hatiye. Tişta ku olperest nepejirînin rabûna hukmê qur'anê bi kirinên ango sineta pêxember e. Ev yek bi rastî gelek ecêb e lê tişta ku ez jê fêm dikim hîkmeta vê yekê ev e; gava di pêş de pêdiviyên nû derketin pêşiya we, li gor guherîna demê ew tişt di jiyanê de bibe wek pêwîstiyek jiyanê eger rêveber û zanayên we dikarin wê yekê rewa bibînin ji bo jiyan zehmet nebe.

**Îslam jiyanê hêsan û xweş dike**

Bi rastî hin tiştên nû hene îro li gor têgihîştin û şîroveyên zanyarên olê eger li gorî îro nebin rojev û şîrovekirin, dê wek îro derdora 57 welatên îslamê hene yek nikare li gorî têgihîştina berê li gor îslamê tevbigere. Divê ev yek şaş neyê fêmkirin, ev yek ne daxwaza me ye, ev rastiyeke li cîhanê ye em dibînin. Kî dikare bibêje, misilman li gor olê yan pêdiviyên mirovî tevdigerin! Hatiye asteke wisa ku mirov înkara olê tevî bike lê ev yek ne rast e û ne pêkan e, ji ber ku gava mirov li destpêka îslamê û tevgera Hz. Muhammed dinêre, mirov dikare bibîne ku her tim Hz. Muhammed xwestiye jiyanê hêsan bike û pêşve bibe wekhevî û mafê li nav mirovahiyê bi cih bike. Di pirtûka hedîs melahim de rîwayeta Ebû Dawid ji Ebû Hureyre wiha rîwayet bûye; "Di serê her sedsalê de xweda yekî an hinekan dişîne ji vê ummetê re da ku kar û barên wan ên olî ji wan re sererast bike." Li gor vê hedîsa pîroz eger sehîh be, lê ji ber ku li armanca afirandinê tê, ez bi sehîhtiya wê bawer im. Gelo evên li hember vê yekê derdikevin vê hedîs û ayeta pîroz çawa şîrove dikin. Her kes li gorî kêfa xwe nikare şîrove bike, eger her kes li gor kêf û hestên xwe şîrove bike dê rewşa îslamê ev be. Nakokî û gengeşiya nav alema îslamê gihîştiye asteke wisa xerab mirov ji sererastkirinê bê hêvî dibe, lê eger em dîroknasiyê bipejirînin gelek pirsgirêk çareser dibin.

Mînakek ji dema Hz. Muhammed; 1- Di destpêka îslamê de bi deh caran şirdanê dibû dayika şîr, ango diya şîr dihat hesibandin ev yek dûre pênc caran hat guherandin. 2- Di destpêkê de Hz. Muhammed ziyareta goristanan qedexe kiribû lê dûre serbest kir. Ev yek bi vî rengî şîrove kirine di destpêka îslamê de hêj bawerî taze bûn, nû bûn dibû ku di baweriya mirovan de tevlihevî çêbibûya pêxember ev yek qedexe kir. Lê gava bawerî rûnişt êdî ew xetere rabû Hz. Muhammed serbest kir. Li gor demê li gor pêdiviyê hikum hat guhertin. Li gor vê yekê em dikarin bêjin ola îslamê bi rastî wek pergaleke jiyanê ye, li gor her dem û dewranê pêkan e her tim jiyanê xweş û hêsan bike. Bi vî awayî ol hiştin di çembereke teng de û fetisandin.

Hin tiştên ku dema pêxember bûne yan nebûne em rastiya wê nizanin lê di çavkaniyên dîroka îslamê de hene, em hin tiştan gava bînin ser ziman zehmetiyan dikêşin! Ew tişt îro yan kêmasî ne yan bêwijdanî e û nayên qebûlkirin. Me di nivîsa pêşî de behsa zewaca Hz. Muhammed bi jina xwedîker an zirlawê xwe Zeyd re kiribû. Ez naxwazim dubare bikim.

**Dîroknasî pirsgirêkan çareser dike**

Taberî di sedsala 9'an a zayînê de li Erebistanê jiyaye. Matûridî jî sedsala 9'an zayînê li Semerkandê, li nav gelek erdnîgarî û çandeke cuda de jiyaye. Ev yek qet nepejirandiye, bi tûndî li hember derketiye, gotiye çawa mirov bi jina xwedîkerê xwe re bizewice. Di pey wî re Zemexşerî di sedsala 11'an de li Xorasanê bajarê Zemexşerê jiyaye ku dîrok, erdnîgarî û çand cuda ye. Li gor wî jî çewt hatiye lê fêm kiriye wiha gotiye ev yek li cem ereban ne tiştek çewt e û pêkan e. Di dema Hz. Muhammed de gelek tiştên ku îro nayên qebûlkirin ji aliyê ereban ve jî hene eger ne dîroknasî be mirov dê çawa vê yekê şîrove bike? Pir zehmet e. Ez dikarim vê bibêjim, dîroknasî gelek pirsgirêkên ola îslamê çareser dike. Li dijî wê tevlihevî, şêlûbûn û fetisandinê, ola îslamê jî wek wan olên din di çembereke teng de difetise wek îro em dibînin.

Hin tiştên wê demê pêk hatine lê qur'an ew red nekirine û li dijî wan derneketiye, nayê wê wateyê ew tişt di pêş de kes nikare biguhere, yan herî kêm yekî ku neecibîne wê yekê pêk neyne. Gava vê yekê bi vî awayî bike li gor olperstan ew ji dîn derketiye. Ev yek sosret e. Mînak li gor gelek rîwayet û çavkaniyan pêxember û sehabiyan jî wek çanda wê demê bi zarokên qîzîn re zewicîne, ev yek bi carekê ne ber bi aqil e. Lê eger li gorî şert û mercên wê demê rast bejî lê mirovahî di warê exlaqî de gelek ji wê demê guheriye û niha vê yekê napejirînin û exlaqî nabînin. Li hember vê derkevin û di zagonên xwe de qedexe bikin nayê wê wateyê ku li hember olê derketine û çanda îslamî red kirine. Gava em dibêjin di olê de reform pêwîst e, di van mijarên exlaqî û hin ehkamên ku bi demê re pêwîst e biguherin. Lê mixabin olperest û simsarên olê vê yekê napejirînin û bi tundî li hember derdikevin, nahêlin di olê de reform çêbibe.

Em mînakekê ji dema Hz. Omer bidin û nivîsa vê hefteyê jî bi dawî bikin. Di sûreya Tewbe ayeta 60'î de, kesên ku bac (zekat) ji wan re bê dayîn 8 beş in. Yek ji wan ku dilê wan hêj nazik e, ber bi baweriya xurt ve tê kişandin. Di dema Hz. Pêxember de ev yek wisa bû. Dema xîlafeta Hz. Ebûbekir jî berdewam kir. Hetanî dema Hz. Omer, tevî ku di qur'anê de hebû jî ev yek guherand û got ev beşa hanê hewcedarî pê nema, dayîna bacê (zekat) ji wan birî, qut kir neda wan.

**Îslam ne sabît e**

Wê demê gelek li hember derketin bêguman. Ev yek di destpêka îslamê de ye ku şûreşa îslamê lawaz bû. Pêdivî bi endam û şervanan hebû. Ev yek ji bo dilkêşiyê dilxweşkirina bi ola îslamê hebû, ev yek hewce bû lê di dema Hz. Omer de şoreşa îslamî xurt bû, êdî hewceyî bi pir endaman nema. Hz. Omer ev yek guherî. Gelo gava mirov dibêje qur'an an ehkamê ola îslamê ne gerdûnî ye, çima olperest li hember vê derdikevin?

Zilma herî mezin ew e ku li ol û şoreşa îslamê dikin bila xwedî wijdan bin. Rast e, dûre Hz. Osman û Hz. Elî ev careke din pêk anîn. Bi vê daxuyaniyê min xwest, ez vê yekê bidim zanîn ku ola îslamê ne tevgereke sabît û qet nayê guherandin. Ehkamê olê li gor cih, şert, merc û dîrokê û li gor pêdiviyan dibe ku biguherin. Em ê li ser ve mijarê di demên pêş de bisekinin.



# Rûxandina mirateyên pişt Sovyetê



Kurdistan Lezgiyeva

'Rêhesina Moldova' tevgera trênên herêmî û bajarî sekinand. Tenê sê ji wan li wir man; Kişinov-Ungêni, Kişinov-Bêndêri û Bêltsi-Oknitsa. Ev di rastiyê de tê wateya rawestandina tevahiya ragihandina rêhesinî li Moldovayê. Bi hesabkirina 800 milyon leyî (37 milyon dolar) deynên berhevkirî, ewle ye ku mirov bibêje ku rayedarên moldovayî veberhêneran nabînin ku amade bin li ser lêçûna xwe karsaziyek aşkera bêhêvî bikin. Ev tê vê wateyê ku divê em li benda firotina girseyî ya bermayiyên milkê Makîneya Rêhesinê bi rastî di metalê duyemîn de bin.

Ji ber vê yekê, Moldova dibe yekemîn komara pişt-Sovyetê ku mîrateya Sovyetê dişikîne û vedigere dewleta dorhêla xizan a dûr, a ku ew berî Şerê Cîhanê yê Yekemîn bû.

Divê were zanîn ku ew ne bi tenê ye. Ya di rêzê de ji bo hilweşînê Baltik e. Di dawiya meha çileya 2021'ê de, Rêhesina Letonî dest bi firotina girseyî ya milk kir. Di nav wan de rêlên ji bo metal jî hene. Ji ber nifûsa kêm û sekinandina veguhastina barhilgir a rûsî, rêhesinên estonî bi bêdengî li bendê ne.

Bi kêmanî, Lîtvanya hîn jî xwe ragirtiye ku kariye bargirana veguhastina rûsî û belarusî bigire. Lê li wir jî, bi gelemperî, her tişt xirab e, ji ber ku ew bi saya euro, alîkariyên ku bi rastî diqedin dimîne. Yekitiya Ewrupayê (YE) her tiştê ku ji bo xwe balkêş dibîne ji Baltikan standiye û êdî wateya xwe di domandina belaş a wê de nabîne.

Lêbelê, welatên Baltik, bi kêmî ve heya 2021'ê, xwedî derfet bûn ku ji fonên navendî yên YE'yê ku heya %10-11 ji berhema navxweyî ya neteweyî, alîkariya madî ya qasê bi kar bînin. Vê yekê bi zelalî rêjeya hilweşîna binesaziyê kêm kir. Lê yên ku alîkarî wernegirtin, hewce bû ku trênan li ser mesafeyên dirêj guncav bikin, bi tevahî poşman bûn.

Heger tedbîrên lezgîn neyên girtin, heta sala 2025'an dê Rêhesinên Ukraynayê hebûna xwe biqedîne. Ew ji salên 90'î ve nehatine tamîrkirin, şewata jixweber a trênan hema hema bûye norm. Trêna mazotê Sumi-Merçik şewitî, di meha çileya 2020'î de trêna Kharkov-Kherson şewitî. Hikûmeta Ukraynayê hewl dide ku «Ukrzaliznitsa» bifroşe operatorê alman, lê danûstandin serneketî ne.

Biçûkbûna aboriya wan welatan nahêle ku barkirina herî kêm a ji bo xweseriyê hewce dike, misoger bikin. Mînak, mirina binesaziyê ji bo dewletên Baltik, ku RUSSTRAT di gotara "Wext hat ku Latvia heqê Rûsofobiyayê bide" nivîsî, ji aboriya van welatan re tu şans nahêle.

Di demên Sovyetê de, rêhesinên komaran bi diravên gelemperî dihatin çêkirin û bi wezîfeyên berbiçav re hatibûn belavkirin. Her ku rûsofobî li wir dijwartir dibe, têkiliyên aborî û bazirganî tên hilweşandin. Qada pişt-Sovyetê bi bêdengî vediguheze çoleke feqîr, cihekî di navbera du şaristaniyan de: rûsî û ewropî.

Wekî din, heger "dagirkeran", wekî moda ye ku îro ji serdema Sovyetê re tê gotin, binesazî û pîşesaziya "gelên bindest" bi çalakî bi pêş ve bixin û teknîkê baştir bikin. Wê hingê YE'ê bi vê çolê tenê wekî çavkaniyek hêza karî ya herî erzan bi kar bîne. Ew vê yekê bi rengek sade bi dest dixin - gav bi gav di asta standarda jiyanê de li bejahiyê kêm dibe.

Di sibata 2014'an de, ukrayniyan welatê xwe şikand ji bo xatirê "Komeleya Ewro-yê û rêwîtiya bêvîze". Ji % 20 welatiyên moldovayî "bidestxistina pereyan", di xebata herî kêm dirav, qirêj û dijwar de li Ewropayê ne. Bi heman rengî, dewletên Baltîkê di 30 salan de ji %30 nifûsa welatê li wir winda kir.

Lê ev dirêj bidome. Stokên Sovyetê êdî diqedin. Derket holê ku Moldova xeleka herî lawaz e. Ji ber vê yekê çarenûsek bi vî rengî li benda hemûyan e.

**Wek encam:**

Ji hêla pergala kapîtalîst a kurewî ve rewş pir zelal û vekirî ye. Pêvajoya ku em jê re dibêjin Şerê Cîhanê yê Sêyemîn her diçe berbelavtir û mezintir dibe. Pergal ji qeyran û kaosa xwe re nikare çareseriyekê bibîne. Berevajî ji bo çareseriyê gavên tên avêtin hem bi ser nakevin, hem jî li ser bingeha kûrkirina neçareseriyê bi vê rolê radibin.

Ji bo pêşerojeke alternatîf biafirînin pêwîstî bi hişmendî û zanyariyeke rexnegir û sosyalîst heye. Hişmendiyeke biexlaq û bawerî nehatibe xweyîkirin mahkûmê tunebûnê ye. Yanî ji bo sekneke dijber, ji bo qutbûnê lazim e rexne, zanyarî, exlaq û bawerî hundirîn bibe û helwesta şoreşger a wek di demên Sovyetê de derkeve holê. Qutbûna bikok tê wateya têkiliyên newekheviyê yên modernîteya kapîtalîst ku ferz dike qebûl nakin. Qutbûna bikok dema di asta îdeolojîk, polîtîk, etîk-estetîk, çandî û civakî de tê jiyîn bi wate dibe. Asta vê qutbûnê girêdayî asta têkoşîna jiyana rojane, civakî û pratîk e.

# Dûstê asîmîlekerdena de xoverdayene

Meral Ozel

Hukumdarî serva dewamê rejîma xo kam kî yenan rê niyo yênan sero zorvajiye danê ramitene, yenan cenê binê bandora xo. Qûwetê hukumdaran yê bingeyîne asîmîle-kerdena mordemî ra yeno. Coka bingê herîşan de vîndîkerdena ziwan esta. Gorê qûwetanê emperyalîstan eke jû qom ziwanê xo qeseykerdene û nûsnayene nêzoneno, o waxt ret kuno binê hukumdarîya yênan. Ziwan ra dima herîşê kulturzagon kenê û kamayîsê mordemî hedef cenê. Ziwan û kultur ra dima kî îtîqat yeno hedef guretene. Eke jû qom hukumdaran ra qeyir wayirê îtîqate de bîno, o waxt naye ser kî planê qilerîne yenê virastene. Hukumdarî, nî her hîrê herîşan piya eynî demî de raye ra benê.
Nika keso ke bi ziwanê xo besenêkeno xo biyaro ziwan, besenêkeno qeseybikero, besenêkono binûsno ya kî nêwazeno qeseybikero o waxt hetê kultur ra kî no kes rovileşino. Coka dîna sero kamci dûgele bena va biba, hukumdarî sifte ziwanê şarê bindest hedef cenê. Tirkîya ke ronayena Komare ra heta roza ewroyîne şaran sero na polîtîka da ramitene. Hîn kerda de eke ma ke kurdan ra qeyir vajîme pêro asîmîle kerde, hurendiye de beno. No kes raştîya polîtîkaya girana. Raştîya plananê bi desan serran a. Kurdî vera nayî de bi se-serrano tekoşînêk pîlî dane. En jede kî qeseykerdena ziwanê xo ardê heta roza ewroyîne.
Ewro namê kurdîya çik esto, wazenê kokîra biesternê. Genco ke kuçe de kurdî qeseykeno yeno qetîl kerdene, roza de bîni karkerî rîwalê kurdî qeseykerdene ra rastê herîşî yenê, komelî yenê guretene, tabelayî ke kewtena sukan de, qazayan de xeylê ziwanan ameyî nûsnayene hurendiye ra yenê war ardene û kurdî ci ra yeno esternayene. Lewî nînan de en jede kî raya perwerdeya ziwan rê herî kenê. Wezîrê Perwerdeyî nikayîn ke jê yê virenan jû ziwan serra qeseykerd, tirkî ra qeyir ziwanê bînan de perwerde dayene qebûl nêkerd.
Ziwan kamayîs o, ziwan kulturê kurdan o û ziwan îtîqat o. Her jû sûke de ramitisê asîmîlasyonî vurîyeno. Nayî çinay rê van; hefte virene Parlamenterê HDPyî yê Dersîmî Alîcan Onlu meseleya qaraqolan ra wendena ezanî ard rojdemê Meclîsî. Dersîm de kurdî ciwîyenê, bi ziwanê kurdî kirmanckî qesey kenê û îtîqatê xo kî Reya Haqî-elewîyê. Her hetî ra asîmîlasyonêko xorî şarî ser de yeno rayeraberdene. Terteleyê Dersîmî na rîwal ra bî. Serva xoserbîyayîsî qomî axme kerdene, kamayîsê kurdî ra durkerdene. Dersîm de camî na rûar ra dewan de ameyî virastene, domanê malbatan ra na rûar ra guretî û rûsnayî Îmam Hatîban. Nî kesî ke hetê dewlete ra ameyî perwerde kerdene nika serva miletê xo kolekerdene gurenê. Asîmîlasyon, kokanê xo ra durîkewtene û binê bandora hukumdaran kewtene nîya ra.
Verva asîmîlasyon û înkar mordem besekeno teyna bi xoverdayena xo bisevekno. Pawitena ziwan pawitena kamayîso, pawitena ziwan pawitena xobîyayena. Çitur kî kolonyalîstî wazenê kurdan kok ra biesternê, gorê nayî planan kenê û ganî kurdî kokanê xo rê giredayî bimanê. Raya sifteyîne ke ziwanê xo ra, estebîyayena xo ra haskerdena. Devlete her rayî serva asîmîlasyon ana kar ardene. Hama kurdî serva kamayîsê xo xeylê rayî guretî. Eke mordem raşt biwazo besekeno çarxê hukumdaran bişkîno. Ziwan rê wayir vejîyayene, xoverdayene ya. Ziwan rê wayir vejîyayene, kultur rê wayir vejiyayene ya, kultur rê wayir vejiyayene bi ziwanê xo venga Haqî dayene ya. Pêro jûbîn rê giredaye yî. Ê ke wazenê îtîqatê Reya Haqî rê wayir bivejerî, wa bi ziwanê xo vengê jiyaranê xo biderî.



## Wa Babacan raştîyan pare bikero

Merkezê Xeberan

Dewa Roboskî ya qezaya Qilabanî ya Şirnexî de 28ê kanûna 2011î de 34 doman û ciwanê kurdî netîceyê bombardumanê artêşa tirke de ameybî qetilkerdene. Seba ke prosesê hukmkerdişî newe ra dest pê bikero keyeyê mexduran do muracatê Mehkemeya Qanûnê Bingeyî (AYM) bikerê.

Serekê Pêroyî yê Partîya DEVAyî Alî Babacan 6ê nîsane de Kongreyê Yewine yê Asayîşî yê Şirnexî de qisey kerdbî û wina vatbî: “Roboskî paweyê edaletî yo. Hemwelatîyê ma yê ke Roboskî de cuya xo vindî kerdî paweyê edaletî yî. Kesêk înan ra ozur nêwaşt. Ma nêwazenê dayîkanê bi çimanê hesir dekerdeyan bivînî.”

Keyeyê Roboskî reaksîyon nîşanê Babacanî dayî û dîyar kerdî ke eke Alî Babacan zerrî ra nê çîyan vano wa rayaumûmîye rê raştîyan pare bikero.





## Ekber Kaya: Ezan kenê argumanê asîmîlasyonî

Dewa Muxundî ya pabesteyê qezaya Mazgêrdî ya Dêrsimî de badê zîyaretê walîyî qereqolanê dormeyî ra ezan ameybî wendene. Dewa Muxundî ra dima dewanê Germîsî, Dirban û Faracî de zî qereqolan ra ezan ame wendene. Dewijê nê dewan û şarê elewî sere de xeylê dezge cayî nêrazîbîyayîşê xo mojnayî. Serekê Şûbeyê Dêrsimî yê Komeleya Kulturê Pîr Sultan Abdalî (PSAKD) Ekber Kaya zî derheqê babete de qisey kerd.

Kayayî nêrazîbîyayîşê xo mojna dewanê elewîyan de wendişê ezanî û wina va: “Hêrişê vera bawerîya ma û asîmîlasyon dewam kenê. Tarîx ra nata vera nê caardişan xoverdayîşê şarê elewî dewam kerdo. Bawerîya xo da cuyayene û ard roja ewro. Serra 1980î de pêroyê dewan de camî virazîyayî. Domanê ma erşawîyayî îmam hatîpan. Kerrayê mezelan cara ameyî vetene û vindî bîyî. Hêriş û polîtîkayê asîmîlasyonî dewam kenî. Ez wazena vaja ke elewî wendişê ezanî ra aciz nîyî, çimkî no rîtuelê bawerîye yo. Ganî ma zî hurmet nîşan bidî. Îtîrazê ma ferzkerdiş û asîmîlasyonî ra yo. Dêrsim de xeylê camî virazîyayî, labelê şarê tîya se ra 99 elewî yo. Ezan kenê argumanê hêriş û asîmîlasyonî.” ***DÊRSIM***

## DAD nêrazîbîyayîşê xo mojna

Dewa Muxundî ya qezaya Mazgêrdî ya Dêrsimî ra dima dewanê Germîsî, Dirban û Faracî yê qezaya Mazgêrdî yê Dêrsimî de zî qereqolan ra ezan ameybî wendene. Dewijan vera mesele nêrazîbîyayîşê xo mojnabî û dabî zanayene ke dewê înan dewê elewîyan ê û bi nê hawayî dewlete wazena înan asîmîle bikera. Merkezê Pêroyî yê Komeleya Elewêyê Demokratîke (DAD) zî nêrazîbîyayîş mojna na rewşe û derheqê babete de eşkerayîyêke nuştekî da.

Eşkerayî de wina ame vatene: “Dewanê elewîyan de rike vera ezan yeno wendene. Ferzkerdiş argumanêk îqtîdarî yo. Kesê ke îslam xo rê kenê çek hem şarê elewî rê hem zî ezanî rê zulim kenê. Qetlîyamê Dêrsimî sey nika hema vîrê ma de yo û kesê ke wina kenî wazenê qetlîyam reyna bikerê ma vîr. Ganî rayaumûmîye, aqilmendê raştî yê îslamî û dezgeyê elewîyan vera zulmî bivejî. Vera şarê Dêrsimî de hertewir teda dewam keno.” ***BRUKSEL***

## Ganî ma pêro tewrê kampanyaya îmzayan bibê

Wezîrê Perwerdeyî yê Tirkîya Zîya Selçukî cewab da vernîyazê Wekîlê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Sêrtî Sidik Taşî. Taşî vernîyazê xo de perwerdeyê bi ziwanê dayîke ser o persêk pers kerdbi. Zîya Selçukî cewabê xo de wina vat: ''Tirkî ra ber pê ziwanêkê bînî perwerde do nêro dayene.''

Platformê Ziwanê Kurdkî vera nê cewabî nêrazîbîyayîşê xo mojna û venga her kesî da ke vera vateyanê Selçukî bi xurtî beşdarê kampanyaya îmzayan a kurdkî bibo.

Platformî da zanayene ke ewro xeylêk dbistan, lîse û zanîngehan de bi kurdkî perwerde yeno dayene û vat: ''Wezîrê Perwerdeyî ney nêzaneno? No ziwan ziwanê dayîk nîyo? Têna tirkî ziwanê dayîke ya? Merdimê sey Zîya Selçuko ke profesorê perwerdeyî yo ganî meseleyê merdiman çareser bikerdêne têdûştî û demokrasî bipawitêne. Heta nika selhîyetdaranê dewlete kurdan rê çareserîyêke pêşkêş nêkerde. Ganî ma pê pêro hêzê xo tewrê kampanyaya îmzayan bibê û statuyê xo pê îmzayanê xo eşkera bikerê. Wa bizanîyo ke kurdî seba kurdkî statuyêkê fermî wazenê. Wa her kes bizano ke kurdkî estbîyayîşê ma yo.'' ***AMED***



# Ez êdî li vê kerê siwar nabim

Zelika kor ji panzdeh rojan carekê diçû ser ziyaretê, (ziyareta şêx Muhemedê Sinê) dema ku roja ziyaretê dihat, biraziyê wê ew li kerê siwar dikir û dibir ser ziyaretê. Rojekê zilam dibêje ku ea lîstikekê neynim serê meta xwe, ez ê hîna gelekî herim vê ziyaretê û werim.


Dema ku roja ziyareta meta wî tê, zilam dest bi lîstika xwe dike. Zilam kerê amade dike û bang li meta xwe dike, dibêje metê were, ker amade ye, were ez te bibim ziyaretê!

Werhasil meta xwe perepaşkî li kerê siwar dike û bi rê dikevin. Hinekî diçin; Zelikê dibêje, kurê min ez ne şaşbim ev ker berepaşkî diçe! çima? Biraziyê wê dibêje me vî kerî nû kiriye, loma nizane bi pêş ve here û şûjinê di kerê re dike; ker zîtikan diavêje û metê ji kerê de dikeve xwarê.

Zilam bi milê meta xwe digire, dixwaze ku wê cardin li kerê siwar bike, meta wî dibêje na, ez li kerê ku berepaş diçe siwar nabim

Û wiha birazî ji çûndin û hatina ziyaretê xelas dibe.

***Riza Uyar***




# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**1-** Tiştek min heye
Çavilbûk
simbêlbirnêz
De bêjin ew çi ye?

**2-** Tiştek min heye
Çaviya min a şûştî û veşûştî
Xatûnek tê de rûniştî

**3-** Tiştek heye
Çavzero, simbêl belo
Ser dîwarê hembero
Ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**

**1-**Kerûşk, kîvroşk, kêrguh **2-** Dev **3-** Kund

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re par ve bikin. De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Pişk û Mişk di kevçî de**
**min pişk xwar**
**mişk ma di cî de**


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Sêsed û şêst û sê sêşem**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:
***Goştê xweş pisîka reş***

***Çavkanî: Pirtûka Zûgotinokan a Mihemedê Kurdo***



# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Biçûk, ne gir 3. Vê carê, êdî
5. Bajarekî bakurê Kurdistanê, bi sûrên xwe navdar e 6. Şikil, awa
7. Roja em tê de ne 9. Zindî, bi can 12. Yanî, tê wateya ku
14. Bersiva neyînî 15. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê, bi gola xwe navdar e
17. Cînavkek pirhejmarî 18. Noteke muzîkê
22. Di Zerdeştiyê de xwedanê nebaşî û tarîtiyê

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Bîr, her wiha tê wateya bêdeng be di forma fermanê de 2. Rih 3. Cejin
4. Qertafa pirhejmariyê
5. Meheke biharê
7. Welateke Yekitiya Ewropayê
8. Amûreke muzîkê
10. Pêxemberek
11. Cihê xwedîkirina dewaran
13. Birêketin, çûn
14. Cejneke neteweyî ya kurdan
16. Amûreke xemil û xêza jinan, her wiha tizbî jî ji wan pêk tê 19. Ezmanê herî bilind
20. Soz, bext
21. Kurtahiya Neteweyên Yekbûyî bi îngilîzî
23. Sewaleke kedî ku ji bo hirî û goştê wê tê xwedîkirin

Bersiva hefteya borî



# 'Dengbêjî ne karê kalan tenê ye'

Navenda Nûçeyan

**Têkildarî hunera dengbêjiyê, rewş û geşiya dengbêjiyê, me bi dengbêj Îsmaîl Çigrim ê 18 salî re xeber da. Dengbêjê ciwan Îsmaîl dibêje ku dengbêjî ne karê kalan tenê ye û her kes dikare dengbêjiyê bike**

Dengbêjî giyanê demê ye, giyanê deng e, sewta dîrokê û zimanê kurdî ye. Dengbêj dahênerên deng in, çîroka dîrokê vedibêjin; dikêlimin û dikemilînin. Yên biyanî gava behsa kurdan dikin, kurdan bi bîr tînin, eseh qala dengbêjan dikin. Kurd gava ji hev re behsa awaz û kilaman dikin eseh behsa dîwanên dengbêjan dikin. Dîroka kurdan dîroka dengbêjan e. Heta niha gelek jin û mêran bi dengbêjiyê dengê xwe li dinê hiştine. Kesên ku bikaribin dengê xwe li dinê bihêlin qe dimirin!

Dîroka kurdan dîroka Evdalê Zeynikê, Reso, Şakiro, Mihemed Arif Cizrawî, Şeroyê Biro, Meryem Xan, Sûsika Simo, Fatima Îsa, Kawis Axa, Karapetê Xaço, Eyşe Şan, Aslîka Qadir, Keremê Kor e. Bi rojan bêjmerî naqede. Ev kevneşopî her di nav kurdan de berdewam e, mîna xisletekê, mîna razekê ye.

Di nav kurdan de gelek dengbêjên nû xuya dibin, bi terz û şêwazên xweserî xwe û heyama xwe dengbêjiyê dikin. Yek ji van dengên dîrokê jî Îsmaîlê Çigrim e. Çigrim, bi temenê xwe yê ciwan û zîrekiya xwe mirov ji xwe re hejmekar dihêle.

**Dengbêjekî ciwan ji Serhedê**

Îsmaîl Çigrim ê 18 salî li gundê Dêrika Ewranê ya navçeya Gimgimê ku bi ser bajarê Mûşê ve ye ji dayik bûye. Wekî tê zanîn, Serhed bi dengbêjên xwe navdar e. Îsmaîl dibêje: "Ji 14 saliya xwe vir ve ez dengbêjiyê dikim" û lê zêde dike, "Berê dengê min nexweş bû, gava min stranekê, kilamekê digot, yên derdora min ji min direviyan. Min di telefonekê de dengê Şakiro seh kir, pir kêfa min ji dengê wî re hat. Ez rabûm, min bi dengê xwe yê nexweş dest bi dengbêjiyê kir."

Çîrok û efsaneyên dengbêjan pir balkêş in. Jê dipirsim, ka serhatiyên te yên bi vî rengî hene an na? Îsmaîl dibêje: "Hema hema. Carekê ez çûbûm Diyarbekirê, ser ziyareta Hz. Silêman. Min li wir dua kir û got 'ya rebî tu dengekî wisa bidî min bira tenê li dengbêjiyê were, li kilamên din neyê jî dibe'. Piştî wextan min dît ku li dengê min êdî tê guhdarkîrin, tê ecibandin. Kêfa miletê ji dengê min re dihat êdî. Vê jî qewetek da min."

Îsmaîl li ber destê kesî fêrî dengbêjiyê nebûye, ya wî behremendî û şiyaneke xwezayî ye. Mektebê naxwîne lê dengbêjî mekteba wî ye, ew bi xwe xwe hîn dike.

**Dengbêjî antîbîyotîk e**

Çigrim dengbêjekî zîrek e, hewl dide jiyana xwe û dengbêjiyê bi hev re bimeyîne. Dema behsa dengbêjiyê dike baweriyekê dide meriv: "Dengbêjî ji bo min antîbiyotîk e. Serê min bêşê ez li ser serê xwe dibêjim, êşa min derbas dibe, çokên min biêşin ez li ser wan bibêjim derbas dibe. Her kesek ji bo ku bêhna wan bê ber wan, aram bibin tiştên cuda dikin, ez jî dengbêjiyê dikim."

**Bajar bi bajar digere**

Dengbêj Îsmaîl bajar bi bajar digere û kilaman dibêje. Li Kurdistan û Tirkiyeyê , hema li kolanan, li kafeyan rûdinê, destê xwe dibe ber guhên xwe û dilobîne. Li ser vê îsmaîl dibêje: "Dengbêjiya min bertekek e. Ez dixwazim bi dengbêjiyê serî rakim. Lewra dengbêjî nîşaneya herî xurt ya hebûna min e. Ew sînorê cîhana min xêz dike" û wiha dewam dike "ez dibêm qey, li cîhanê gelek kes hene ku qet guh nedane dengbêjiyê, ez dixwazim vî dengî, vê awazê û van çîrokan li nav miletan, li nav her kesî bigerînim, belav bikim. Ku ji destê min bihata minê hoparlor bi cîhanê ve bikira û min ê dengbêjiyê bi her kesî bida guhdarîkirin."

**'Dengbêjî ne karê kalan tenê ye'**

Îsmaîl dema ku behsa dengbêjan û dengbêjiyê dike di hin mijaran de zivêr dibe û dibêje: "Dengbêjî  ne karê kalan tenê ye. Ne karê mêran tenê ye. Ciwanek, jinek jî dikarin dengbêjiyê pir serkeftî bikin. Tu kes bi cil û bergê xwe, bi rû û rûçikê xwe kilaman nabêje, bi zar û ziman û hestên xwe dibêje."

Mijareke mayîn a ku Îsmaîl jê aciz dibe mijara xwedîderketina çanda dengbêjiyê ye. Bi pêşbîniyeke zelal rewşa dengbêjiyê dinirxîne: "Çawa ku ji bo stranbêjan konser tên dayîn, bila ji bo dengbêjan jî konser bên çêkirin. Bila miletê me ji bo wan tiştinan ava bikin. Bi mala dengbêjan tenê nabe. Ez naxwazim dengbêjî wekî çandeke kevn di nav me da bimîne, yanî bila nebêjin dengbêjî di berê de maye. Dengbejî ne kalê me û bavê me ye ku dema ew mirin, em jî bibêjin wele ji holê rabûn û çûn. Dengbêj dimirin lê dengbêjî nemir e, tu carî derbas nabe. Ji ber ku qîmet nadinê û guhdar nakin dengbêjên nû jî dernakevin."

**'Dengbêjî ne deng e gotin e'**

Dengbêjê ciwan dibêje: "Di dengbêjiyê de tiştê girîng ne sewt e, gotin e. Di dengbêjiyê de divê meriv ji deng bêtir guh bide gotinan. Lewra dengbêjî beriya her tiştî çîrokekê dibêje. Piştî te meqam zeft kir, êdî gotin te dikşîne nav xwe. Di stranên din de tenê milet guhê xwe dide deng. Ser meselê, hin kes hene bêyî ku ziman bizanibin, li stranên biyanî guhdarî dikin, distrên. Lê binihêre, ji naverokê, çîrokê bêhtir, deng xwe dide guhdarkirin."

**Ji  20'î zêdetir kilamên wî hene**

Îsmaîl dengbêjekî jêhatî ye û hilberîner e. Li gelek dengbêjan guhdar dike, kilamên Şakiro û Huseyno dibêje, kêfa wî ji deng û şêwaza dengbêj Muxtar re tê. Tevî vê yekê Îsmaîl bixwe jî kilaman çêdike û dibêje. Heta niha ji 20'î zêdetir kilam çêkirine. Dema ez jê dipirsim, kilamên te li ser çi ne, wiha dibêje: "Ez zêde li ser evînê nanivîsim, kilamên min bi piranî li ser şer û şînê ne. Van salên dawîn min kilamek jî li ser Efrînê çêkir."

**'Em hunera jinan ji wan didizin'**

Di dengbêjiya kurdan de tim bala min kişandiye jin bêtir kilaman li ser evîn û şînê çêdikin, mêr jî bêtir li ser şer û pevçûnan çêdikin. Lê jê seyrtir, gelek dengbêjên mêr hene, kilamên ku  ji aliyê jinan ve hatine çêkirin dibêjin. Min dixwest ez ji dengbêjên mêr bipirsim 'ka dema ew hin kilamên xwe ji devê jinekê dibêjin çi hîs dikin û çima vê tiştê dikin. Ez pirsa xwe ji dengbêjê ciwan, ji Îsmaîl dikim. Ramanên xwe wiha tîne zimên: "Mirov dema kilamekê bi dengê jinekê bibêje çêtir e, lewra hest li ba wan xurtir e. Jin li gorî mêran kûrtir dijîn. Xem, bextewarî û kelecaniya wan kûrtir e. Em mêr zêde tev li jiyanê nabin. Bi vê yekê re, em mêr radibin vê tiştê jî ji jinan didizin. Ew hunerekê dikin, hildiberînin lê ji ber ku berhemên wan ji yên me kûrtir û tîrtir in, em radibin wê tiştê jî ji wan didizin. Wekî gelek tiştî, me ev tişt jî ji wan standiye."

**'Divê dîwanên me kêm nebin'**

Walter Benjamîn di gotara xwe ya bi navê Çîrokbêj; Ramanên li ser berhemên Nikolay Leskov  de dibêje: "Guhdarê çîrokekê, mêvanê çîrokbêj e, xwînerê çîrokê jî dikare di vê dîwanê de cihekî ji xwe re peyda bike. Lê heçî xwînerê romanê ye, ew xwînerê herî tenêmayî ye." Ji bo ku em demildest guh bidin dengê Îsmaîl, li çîrokên wî guhdarî bikin û em dawî li vê tenêtiya xwe bînin, em axiriya gotinê didin Îsmaîl; ji bo dengbêjên wekî xwe ciwan wiha dibêje: "Berê dengbêjan diavêt ber hev. Zemanê berê ev lec û reqabet pir xweş bûn. Lê niha em bi endîşe û bi teherekî din lê nêzîk dibin. Ez naxwazim ku ev reqabet me ji hev dûr bixe. Divê em jî bikaribin bi berdewamî dîwanên xwe deynin."



# GOG ji bo zarokan ji kêf û şahiyê wêdetir e

Navenda Nûçeyan



Kovara Wêneromana Kurdî a Zarokan GOG ku bi zaravayên kurmancî û kirmanckî weşanê dike, bi hejmara 3'yemîn a meha nîsanê, hat weşandin. Kovara GOG'ê bi awayekî online ango li ser dîjîtalê weşanê dike. Di vê hejmara nû de dîsa çîrokên xêzî yên Red Kît, Yakarî, Thorgal û Mîlo hene.

Têkildarî weşana kovara wêneromana kurdî rêvebirê giştî yê kovara GOG'ê Îmam Cîcî bersiv dan pirsên me.

**wêneroman xweîfedekirin e**

Îmam Cîcî da zanîn ku parastina zimanekî tenê bi veguhêzana çandî pêkan e û wiha got: "Ger em bixwazin vê pêk bînin, divê em ji nivşên nû re weşanên ku bikaribin bi zimanên xwe bixwînin bigihînin ber destê zarokan. Weşanên xêzî jî ji bo vê rêya herî rast û kurterê ye. Wêneroman bi wêneyên ku hev dişopînin û bi hevokên kin xwendin û nivîsandina kurdî hêsan dike. Wêneroman li hemû cîhanê ji bo zarokan tenê ne kêf û şahî ye, heman demê xweîfadekirina hunerî ya herî bi bandor e. Di rewşek wiha de nebûna çanda wêneromana kurdî kêmeniyek pir mezin e. Bi GOG'ê re armanca me ya bingehîn ew bû ku em vê kêmaniyê ji holê rabikin."

**Zextên li ser zimanê kurdî**

Rêvebirê giştî yê kovara GOG'ê Îmam Cîcî destnîşan kir ku tevî wan li hemû medyaya kurdî û medyaya tirkî ya muxalif a pir caran nûçe û roportaj weşandine, dîsa jî xwendekarên wan pir kêm in û wiha pê de çû: "Ligel hemû van piştgiriyan gelek sedemên negihiştina GOG'ê ya xwendevanan hene. Zextên li ser ziman û siyaseta kurdî, piraniya gelê me ku ne xwedî derfetên aboriyê ne ku bikaribin li ser onlînê bixwînin, ji neelimandina xwendinê û hwd. gelek sedem mirov dikare rêz bike."

**Xebatên ji bo weşana**

Îmam Cîcî diyar kir ku ew dixwazin derbasî weşana çapê jî bibin û wiha axivî: "Bêyî ku em dereng bikevin em dixwazin bi awayê çapê weşana kovarê bikin. Lê mixabin ew hêza me tune ye. Bi piştgiriya hevalên me yên ku têgihiştine girîngiya kovarê encax karibin 12 hejmaran derxin ku em dikarin lêçûnên telîfên biyanî, werger û binesaziya webê derxînin. Em vê jî ji bo ku me ji xwendevan û yên piştgirî dane me re soz daye, dikin. Nexwe bi vê firotinê re wekî dîjîtal encax em dikarin salekî temam bikin. Em bi vê ceribeyê vî tiştî jî hîn bûn ku ev kar derbasî weşana çapê nebe dê nemeşe. Ji bo vê em hevdîtinên xwe didomînin."




**Rêwîtî dê bidome**

Îmam Cîcî herî dawî di derheqê plan, armanc û bernameyên xwe de axivî û wiha got: "Ligel xebatên me yên temamkirina sala GOG'ê em ê weşana wêneromanê berdewam bikin. Tenê ji bo ku em wêneromanan çap bikin me Weşana Şemkûrê ava kir. Seruvena GOG'ê dê çawa bibe em nizanin, lê di dawiya salekê de em derbasî weşana çapê nebin em ê dest bi weşana albumên wêneromanên kurdî bikin. Her wiha bi komkirina xebatên xwe, em difikirin ku wekî çapê jî weşanê bikin. Bi vê re karakterek xêzî afirandin û bi awayek albuman çapkirin di nav armancên me de ye. Piştre bi teqezî ku em dixazin zarokên kurd bixwînin telîfên romanên xêzî yên biyanî wekî album weşandin di bernameya me de ye. Her wiha em dixwazin bi dehan albumên wêneromanên biyanî û niştecih bi kurdî derbixin. Bi vê rêwîtiya ku me  bi GOG'ê re dest pê kiriye, em difikirin ku hîn bi hêztir em ê berdewam bikin."

xwebûn

12-18 Nîsan 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 69

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Soza min û biraziyê min

Mecîd Rehwerd

**Kirîv li nav me kurdan pir bi qedr û girîng in. Kirîvatî cureke soz û qirarê li nav du malbatan e. Gava ku du malbat bi hev re dibin kirîv, hin erk û wezîfeyên wan li beranberî hev hene. Li desthelaliya lawikan îzna kirîv pir girîng e**



Li nav me kurdên Xorasanê weke her devereke kurdnişîn, hin deb û resmên kevn hene. Yek ji wan resman sinetkirina zarokan an bi gotina me 'desthelalkirin'a wan e ku em bi şahî û dîlan bi rê dixin. Çend rojan piştî birêxistina cejna desthelalkirinê, bang li kirîvê xwe dikin û bi wan re dibêjin ku dixwazin wî karî bikin. Kirîv li nav me kurdan pir bi qedr û girîng in. Kirîvatî cureke soz û qirarê li nav du malbatan e. Gava ku du malbat bi hev re dibin kirîv, hin erk û wezîfeyên wan li beranberî hev hene. Wek mînak li keçikdayîn û bûkxwestinê. Li desthelaliya lawikan îzna kirîv pir girîng e û divê ku bi wan re şêwirînek bê kirin. Dema bêçinê û karên bax û jêkirina mêweyan ji daran û her wekî din jî alîkariyê didin hev, kirîvbûn ewqas girîng, giranbiha û pîroz e û ewqas du malbat bi hev re nêzîk in ku nikarin ji hev bizewicin.

### Orinça cejnê

Li baxê paş hewşa mala bavê min li gund, me konek vedabû. Me ji wî baxî re digot baxê gwîzê, ji ber ku çar aliyê bax darên gwîzan bûn û li nav wan jî bavê min orinçe çandibû. Ew orinça bo sexel û pezên kulek ku ji keriyê pêz diman, berhev dikirin û dibû binceya wan. Çend rojan beriya ku cejn were lidarxistin, birayên min orinçe çinîbûn û piştre erdê wê av dabûn, niha orinçe û gihayên nav wê hêşîn bûbûn û amade ji bo cejneke kurmancî.

Coşeke xweş li nav hewşê bi rê ketibû; li aliyekî çend pez serjê kiribûn û hinekan goştê wan hûr dikirin, hinekan pîvaz hûr dikirin û kartol dişûştin. Li aliyekî hewşê bi keviran û heriyê ûcax çê kiribûn û beroşên tije av danîbûn ser wan, li kêleka ûcêx jî dar û gwîniyan heta tapî û kemre li ser hev danîbûn. Pismam û pisxaltiyên me jî bi meşk û cêran ji kaniya ser pirê ku li paş baxê me bû, av tanîn û berdidan nav beroş û satilên darîn.

Yek ji gundiyên me yê bi navê Tacmeme ku bawer im hosteyê wî karî bû, xurcîneke sor ku dayika min bo sercihaza birayê min (ku niha desthelalkirina du lawên wî bû) çêkiribû, tije kişmîş û şekir û şikolat kiribû û li ser milê xwe danîbû. Erka wî camêrî ew bû ku yek bi yek gundiyan vexwîne cejnê. Ez ji Tacmeme re ji ber vê dibêjim hoste ku hîn jî kes peyda nebûye ku carekê bibêje wî bangî min nekiriye bo filan dawetê. Erê ew li karê ku dispartin wî pir jêhatî bû.

### Amadekariya cejnê

Nîvroj bû û li bin konê, keçikên xizm û cîranan bi xwîşkên min re bi kelecaneke bêdawî mîna ku daweta wan bixwe be û bûka vê dawetê bin, sifreyek ji bo fîravînê vedabûn. Xwarina nîvroja berî birêketina cejnê ji kezebên pêz û kartol û pîvaz û hinek goştê çinîbûyî pêk dihat. Resm ew bû kesên ku li dawet an cejnekê alîkarî didan ji aşpêz bigire heta berdestên wî û yên av û êzing dianîn û xizmên nêzîk, dibûn mêvanê wê fîravînê. Li ser sifreyê jî ji xwarina taybet ya min got bigire heta dewê teze yê mêşk ku dayika min berbanga sibê beriya hilatina royê dan kiribû, heta nanê tendûrê û pincara teze ku ji baxê me yê Çiraxpê hatibû berhevkirin û mastê teze yê pêz hebû. Dema mêvanan xwarina xwe xwar, niha hêdî hedî keç û lawan qada nav hewşê û bêx paqij kirin û diçûn ku xwe bo cejnê bi cil û bergên nû bixemlînin.

### Dîlana kurmancî ya keç û xortan

Berêvarê bû û êdî dengbêj û sazjen û dutarvan gihîştibûn cejnê. Heyderqulî pîqa xwe kok kiribû û bi birayê xwe Saetqulî re li ber deriyê hewşê rawestiyabûn. Saetqulî li doholê dida û Heyderqulî jî pîqa xwe anîbû dêng. Li ber piyên wan ji nav sîniyekê dûyê ûrzelingê li derdorê belav dibû û wan bi melodiya ku ji sazên xwe derdixistin, xêrhatina mêvanan dikirin. Mêvanan jî wek erf û edeteke kevn pereyekî hûr li kêleka sîniyê datanîn. Mêvan bi coşeke mezin dihatin nav bêx. Li wir Metqulî birayê din ê Heyderqulî kemançe lêdida û kurê biçûk ê Heyderqulî jî li defê dida. Heng henga Xanan bû, keçik û xort ketibûn nav govendê û dîlaneke kurmancî bi rê ketibû. Piştî hengê Xanan, yek qerse, du qerse, enarekî, pênc qerse, şeş qerse, diyanzdeh qerse. Matmatî û Qeşmarkî lîstin û paşê lîstika bi şivan bi dar xistin, keçên me bi şilvarên sor û kesk û şîn, govend xemilandibûn. Gava ku li meydanê diketin çerx û tawê, şemal û gulên ser şilvarên wan bi hev re hişê meriv dibir.

### Hine, noxl û keleqendek

Bêhna xwarina ser ûcêx, dengê dengbêjan û coş û kelecana govendê heyecaneke bêmînak pêk anîbû û te nikarîbû çavên xwe ji wan bibirî. Êdî şev hatibû û stêrkên nav asimîn û şelpeyên darên gwîzê jî ev xeml û rewş zêdetir kiribûn. Birêvebera cejnê kirîv bûn, haya wan ji hemû tiştî hebû ku kêmasiyek tune be. Ji vî alî ve jî hinek ji xortan bi dengê dahol û pîqê ji mala kirîv mejmeyek xemilandî ku di nav wî de hine û noxl û şekir û keleqendek hebû tanîn. Çend keçik û jinan mejme û mafûreke biçûk li ser serê xwe danîbûn û dihatin, hinek jî li pêşiya van dilîstin. Ewna hatin û cihek li meydana lîstikê çêkirin, hine li ber mafûrê danîn û çend mist noxl û şekir li derdora mafûrê belav kirin. Du lawikên birayê min li ser dan rûnişkandin û hengên bexşî û dengbêjan zivirî ser merasima desthinekirinê. Bavkal û dapîra wan li kêleka mafûrê û kirîv li paş zarokan rûniştin. Resm ew e ku divê dapîr niha bistirin. Her yek ji wan sitranek bo desthinekirinê distirîn û kirîvê wan jî destê zarokan hine dikir;

- Va daweta lawê min e // kirîv hinê distirê

- Ew hem dê û bavê min e // kirîv hinê distirê

- Ew roniya çavê min e // kirîv hinê distirê

...

Dapîra din;

- Çiraxpe jî we kereng e // kirîv hinê distirê

- Keçik têne renge-reng e // kirîv hinê distirê

- Keça pêşiyê pir qeşeng e // kirîv hinê distirê

...

Piştî dest hinekirinê û piştî ku zarokan para hineya xwe ji kefa miştê her du lawikan rakirin, hineya mayî û şîranî û noxl û newat li nav mêvanan belav kirin û domahiya cejnê heta nîvê şevê berdewam bû.

### Cil û bergên li nav mejmeyekê

Sipêdeyê, beriya hilatina royê, çend kes ji bo paqijkirina hewş û bêx ji xewê hulistiyan; jinan nan li tendûr dipatin û hinekan av ji kaniyê dianîn û hinek jî dibûn berpirsa amedekirina taştê. Taştêya sibetira şeva cejnê jî ji penîr û mastê nav tîcên û rûnê zer û nanê ku teze ji tendûrê derketibû, pêk dihat. Piştî xwarina taştê ku xelk hêdî hêdî dihatin, niha gerê zarok bibirina hemamê. Cil û bergên van du lawikan li nav mejmeyekê danîbûn û sabûn û şeyekî teze û lîf û kîse jî li kêlekê. Keleqendek jî ku xelata hemamçî bû li nav mejmeyê bi awayekî tîk hatibû. Hevriyên wan jî her yekê cil û bergên xwe li nav zembîlê danîbûn; sazjen ketine pêşiyê û bi çepik û şahiyê ew her du lawikên xweşik birin hemamê. Li vir jî gerê yek ji lawikên kirîv hebûya û ewna bibirina û bişûştina. Heta ku ewna ji hemamê vegerin, li nav bêx cejn di roya duyem de bi rê ketibû û dîsan keç û xortan govend xemilandin.

Li hewşê bêhna yexniyê hişê meriv dibir û li bêx jî dîlan û dengbêj. Yexniya ku xwarinek bi goştê pêz û nasyar li navçeya me ye.

### Kuşnî

Nêzikî nîvrojê dîsan sazjen bi dohol û pîqê ber bi mala kirîv ve bi rê ketin û ji wir keçikan bi şilwarên xwe yên reng bi reng weke tawûsan, bi mejmeyên tijî li ser destên xwe, bi pêşengî û lîstin û hilperikîna xortan, tev li cejnê bûn. Resm ew bû ku kirîv cil û bergên teze bo lawikên ku dixwestin destê wan helal bikin distand, kûzekî rûnê zer û birinc û berxek jî wek xelat dida wan. Ew xelatên xwe jî bi hevrêtiya malbat û xizmên xwe û bi saz û stran û lîstina keç û lawan dianîn nav govendê. Li govendê jî çend tezexortên nûrastevahatî amade dibûn ku li pêşiya wan guleşta kurdî an bi gotina me kurdên Xorasanê, 'kuşnî' bigirin. Kirîv û xelatên wî gihîştin nav govendê û li çar aliyên govendê, xortan dest bi kuşniyê kirin. Piştî nîv saeteke kuşnî derbas bû û yê serketî yekem hat û ji kirîv û xwedî cejnê keleqendek û hinek pere xelat stand. Niha dîsan li nav meydanê mafûr danîn û parçeyeke qemîs kişande ser wê û derdora wê xemilandin ku cil û bergên teze yên xelata kirîv li her du lawikan bikin. Berê resm wiha bû ku delak dihat û li vir zarok sunet dikirin. Gava ku delêk karê xwe dikir, kirîv gerê şekirek bikira nav devê zarokan. Lê niha ev yek nemaye û piştî derbasbûna cejnê ewna dibirin bajêr û diktoran ew kar dikir.

Hemî tişt amede bûn û niha gere cil û bergên her du biraziyên min li wan bikirina; lê ji nişka ve me dît yek ji wan tune!! Yê mezintir li ser cihê xwe li ser mafûrê amade rûniştibû, lê yê biçûk peydatune bû. Li nav hewşê, li nav bêx, zeviyên derdorê, li her cihê li wî geriyan, lê ew tune bû. Heta wê demê ku ez çûm min dît wî xwe li xaniyê jêr û li paş kendûya gênim veşartiye!

Bi çavên tije hêstir li min dinêrî. Min got;

- Biraziyê delal! Were, daweta te ye, were gere kincên nû û xweşik li te bikin.

- Na, ez nayêm.

- Te ku hez dikir bo te dawetê bigirin, cilên xweşik li xwe bikî, ma ew daweta te nîne?

- Na ez naxwazim.

- Bo çi?

- Ew çi dawet e we bo min girtiye ku bûk tê de tune?!

Min qet fikra vê yekê nedikir, piştî çend kêliyan min hişê xwe berhevî ser hev kir û ji wî re got;

- Me ev dawet bo vê yekê girtiye ku tu fêrî dawetgirtinê bûyî, lê niha pêwîst nîne bûk jî hebe. Were birazî can. Were ez bixwe soz didim biraziyê xwe ku bûkeke bedew bo te peyda bikim.

- Soz didî Apo?!

- Erê soz didim!

Em bi hev re çûn û me cil û bergên nû li biraziyê xwe kirin û piştra fîravîn xwarin û cejn bi dawî hat.

Niha ez mame û soza ku min dabû biraziyê xwe.



